



## Lênûskên winda

Mirovên xwedî dewlet jî ne azad in. Berê faşizma tirk bi piranî li hemberî kurdan bû, ji bo ku em kurd "terrorîst" dihatin dîtin jî xema kesê nebû lê niha tank gihîştine ber derê her kesê û polîs li hemû deriyan dixin, dişkinin. Êdî faşizm li her... **Mizgîn Ronak/R.2**



## Şevzengilk

Li van rojan dinya nêzikî şeva zengilkê ye, ji hemû deveran tiştê gelek hêsan tê gotin, parastina we bikin, heke hûn nekin kesê din parastina we nake. Weke ku jin ji çiyê dipirse, "te yê pêşiya me jî dîtin, yê piştî me jî dê..." **Kenan Colemêrgî/R.8**



## Rantxwarî û kedxwarî

Vê gavê karê herî hêsan bi riya hizra teorîk dijberiya kapîtalîzmê ye. Yekser em dikarin bibêjin sermayedarî pergaleke talankar e, bi darê zorê keda xebatkar desteser dike, berhemên bi destê wan hatine çêkirin dike... **Ehmed Pelda/R.7**

# xwebûn

4-10 ÇILE 2021 HEJMAR: 55 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

## Li dijî tecrîdê berxwedana girtiyan mezin dibe



Çalakiya girtiyan bi koma 8'emîn di meha duyemîn de didome. Her diçe hejmara girtiyan ku beşdarî çalakiyê dibin zêdetir dibe. Li rûxmi vê rewşê jî desthilata AKP'ê xwe li çalakiyê ker û lal kiriye û têkildarî mijarê tu daxuyanî nade. Çalakgerê greva birçibûnê Mehmet Sidik Baran, ji Girtîgeha Tîpa L a Kalkandereyê ya Rîzeyê, ji malbata xwe re ragihand ku dema dertên axaftina bi telefonê lêgerîna tazî li wan tê ferzkirin. Bavê berxwedêr Baran Temîn Baran, li dijî vê pêkanîna derket û dest-nîşan kir ku pêkanîna lêgerîna tazî pêkanîna Esat Oktay Yildiran e û got ku ew heta dawiyê piştîgîrên daxwazên zarokên xwe ne... **R.3**

AMED TÎGRÎS

### Geşedana dengê zarokan...

R.8

### Kurdistan ne bêxwedî ye!

Meha îlonê rêzefilmê hatîye weşandin. Navê wî rêzefilmê 'No man's land' an jî bi navê xwe yê din 'şerê ji bo nivê heyvê' ye. Mirov dikare bi nav dest pê bike, beriya ku şiroveyek li ser naverokê bike. Rêzefilm der barê şerê li dijî DAIS'ê yê li rojavayê Kurdistanê ye. Vê demê dest-pêkê pîrsa çima 'No man's land' tê bîra mirovan. Gelo dixwazin peyama çî bidin bi vî navî. Xwediyên Kurdistanê diyar in, xelkên Kurdistanê diyar in, lê wisa xuya ye derhênerên rêzefilmê ne bi vî nêrîne ne. Rêzefilm bi çar zimanan hat weşandin, tê de fransî, inglîzî, kurdî û erebî tê axaftin. Her yek ji wan li derdora 40... **Eylem Şores/R.11**

## Romanên bextewar tune ne

Di nav berhemên edebî yê cihanê de roman xwedî cihekî taybet e. Roman bi mijar, awayê vegotîne û hûnandinê her tim ji aliyê nivîskar û xwendevanan ve hatiye nîqaşkirin. Xecê Daşxin jî li ser zimanê edebiyatê û romana kurdî bi nivîskar û helbestvan Nûdem Hezex hevpeyvîn kiriye. Hezex di hevpeyvîna de

wiha dibêje: "Zimanê kurdî di qada edebîyata nivîskî de qadeke beyar e. Loma ne hêsan e mirov çandinîyê li erdeke beyar bike. Divê mirov çend deman cot bike, ji kevir û latan paqij bike. Zimanê kurdî, hê li nivîsbêjîyê nebûye zimanekî civakî loma mirov nikare pê her tiştî bike..." **Hevpeyvîna Xecê Daşxin/R.4**

### Melayê Cizîrî

Dîwana Melayê Cizîrî ji aliyê çêja edebî, hêz û quweta vegotîne û taybetiyên din ve di nav edebiyata kurdan de di dereceya yekemîn de ye. Di nav ereban de Îbnû'l-Farîd, di nav farisan de Hafîzê Şîrazî û di nav tirkan de Fuzulî çî be, Melayê Cizîrî jî di nav kurdan de ew e. Dîwana Mela digel ku yekem e jî di asteke gelekî bilind de hatiye nivîsandin. Melayê Cizîrî, di edebiyata kurdî de ekola tesewîfê temsîl dike, bi gotineke din ew helbestvanekî mutesewîf e, lê digel vî jî ew ne nûnerê edebiyata tekyayê ye. Lewra di dîwana wî de... **Muqdes Agirî/R.5**



### Di ser qetilkirina 'Sê Jinên Azad' re 8 sal derbas bûn

Di 9'ê Çileyê 2013'an de, li Parîsa Paytext a Fransayê jinên kurd ên şoreşger Sakîne Cansiz, Fidan Dogan û Leyla Şaylemez, ji aliyê endamê MÎT'ê Omer Goney ve hatin qetilkirin. Di ser qetilkirina her sê jinên têkoşer re 8 sal derbas bûn. Sakîne Cansiz yek ji sazûmankara PKK'ê, Fidan Dogan Berpirsiyara Karên Derve ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) û Leyla Şaylemez jî endama tevgera ciwanan a Ewropayê bû. Beriya ku doza qetilkirina wan dest pê bike, Omer Goney ê kujer, li Fransayê di girtîgehê de bi awayekî biguman mir. Piştî mirina Goney, dadgeha Fransayê bi hinceta mirina wî dawî li dozê anî.

## Keştiya multecîyan

Verê ke ez şîma rê qalê rayîrwanîya keştî bikera, wazena şîma bibê mêmânê hikayeya mi. Ez kêna yêka 15 serrî ya. Nameyê mi bêwar a. Ma welatêk Rojhelato Miyanên de pêwa dadî, babî û di wayê min ê qijî ma keyeyêk hewşeyî de civiyayîne. Babîyê mi karê necarî kerdêne û dadiyê mi zî terzîxaneyê ci bi. Ez şîne wendegêh. Hevalê mi zaf bî û ma yewbînan ra zaf heskerdêne. Hevalê mi ge-ge ameyîne hewşeyê ma û ma pê dir tewir... **R.9**



### Serê salê û binê salê

Bi xeyalên zarokî, pîrozbahiyên sersalê; heyamên berê sersal bi xeyalên kelecaniya zarokî û bi kenê li ser lêvên wan vediguhezî jî şahiyê. Xeyalên sala borî yê pêknehatî, bi bayê zivîstana sar... **Adar Şaman/R.12**

## PDK û sala 2020'î

Gelê kurd ê hejar ku bi keda dehê salan li başûrê Kurdistanê statuyekê bi dest xistibû, ev beşê welat ji ber polîtîkayên şaş û qirêjî yê PDK'ê ku bi dewleta tirk re hevkarî kir sala 2020'an bi alozî û qeyranan derbas bû. PDK'a ku xwe da kêleka polîtîkayên dewleta tirk wisa lê anî ku dagirkeriya tirk li ser axa başûrê welat hê kurtir bû. Mêtîngerî û kedxwariya di

milê aborî de jî zêdetir bû, qirkirina çandî û asimilasyon kurtir bû. Êrişên dagirkeriya tirk ku di 2017'an de li dijî Xakûrkê dest pê kiribû îsal jî domiya. Dewleta tirk êrişên xwe yê jî sala 2019'an ve li dijî herêmên Mêrgesor, Soran û Çomanê temamiya salê domand. Bi dehan caran ev qad bi balafirên hat bombebaran kirin... **Felemez Ulug/R.7**

### Çîroka elektirîka Farqînê

Dema ku li rojavayê Tirkîyeyê ji bo ceyranê ev hewldan tînin dayîn, li navçeya xweş û şêrîn Farqînê siyasetmedarê kurd Dr. Yûsûf Azîzoglû şaredar e. Azîzoglû, kesekî welatparêz, şareza û ronakbirekî pêşbîn bûye. Hê wê demê ku his û pîsa ceyranê li Kurdistanê tunebûye, Azîzoglû anîna ceyranê ya Farqînê ji xwe re dike xem û ji bo anîna ceyranê ya Farqînê dest bi projeyekê dike. Di dawîya salên 1940'î de Azîzoglû, komeke teknîker li Farqînê li hev kom dike û ji bo hinkirina teknîka hilberandina ceyranê dişîne Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê... **Qedri Esen / R.12**



# Rojnameya jinan; Newaya Jin

Rojnameya Newaya Jin ku mehê carek tê çapkirin, di qada rojnamegeriya jinên kurd de xwedî taybetmendiyek e.

Newaya Jin ku ji 4'ê Nîsana 2005'an ve bênavber li ser xeta azadiya jinan weşana xwe didomîne, di nav van salan de xwe gihand kurdên her dera cihanê. Rojname li dijî hişmendiya bavixsalar a li dijî jin, civak û xwezayê şer dike, xwedî helwest e.

## Danasîn

Rojnameyê di kunyeya xwe de xwe wisa dide nasîn: "Ji qada taybet ber bi qada giştî ve, ji jiyana akademiye ber bi kolanan ve, ji cihana rojavayî ber bi çiyayên Kurdistanê ve, ji zarokan heta ciwanan, ji politîkayê heta mîzahê, ji dîrokê heta bûyerên rojane; rojnameya me qadên wekî aborî, ekolojî, jineolojî, tenduristî, siyaseta, şer, koçberî, berxwedan û têkoşîna ku jinan eleqedar dike û di çapemeniya jinan de li gorî hişmendiya tiştên ku nayên dîtin derdixe holê, tevdi gere."

Newa; li dijî medyaya mêran ku nasname û hebûna jinan tune dihesibîne û jinan wek malzemeyê zêdebûna fîrajên xwe dibîne, têdikoşe û di alterantîfa çapemeniya azad de xwedî îdia ye."

## Naveroka dewlemend

Newaya Jin her meh bi mijarên cuda û naveroka dewlemend di serî de jinên kurd xîtabî hemû jinên cihanê dike ku li dijî her cure tundî û desthilatdariyê li ber xwe didin.

Newaya Jin ku ji 4'ê Nîsana 2005'an ve bênavber li ser xeta azadiya jinan weşana xwe didomîne, xwe gihand kurdên her dera cihanê. Rojname li dijî hişmendiya bavixsalar a li dijî jin, civak û xwezayê şer dike, xwedî helwest e

## Hejmara sala nû

Rojnameya Newaya Jin di hejmarê xwe ya meha destpêkê ya 2021'ê de bi manşeta 'Em ber bi şerê we ve diherikin' derket. Rojnameya ku bi formata nû hatî amadekirin, li ser komkujiyên Parîs û Silopyayê disekine. Di vê hejmarê nû de analîz, vegotin, gotarên bi şewazên biyografîyê hene. Di rojnameyê de siyaseta medara kurd

Gultan Kışanak li ser şertên zindanan ên piştî darbeya 12'ê Îlonê û rola Sakîne Cansiz sekiniye.

Di vê hejmarê de endama komîteya Rojava ya Jineolojiyê Hêja Zerya bi nivîsa li ser jineolojiyê cihê xwe girt.

Gulrux Hatemî di nivîsa xwe de balê dikişîne ser tîgîna 'Femînîcîde', Nurhaq Gulbahar jî li ser rapêrîna gel a başûrê Kurdistanê

disekine.

Di rojnameyê de çîroka jinan a Şîrîn Elemhulî heye ku 9'ê Gulana 2010'an ji hêla rejîma Îranê ve hat darvekirin û her wiha çîroka jiyana aktîvîsta femînîst a Hîndû Tarabî Shînde jî di rojnameyê de cihê xwe digire. Ambargî Arhat Ba jî bi nivîseke bîranînê ya li ser Têkoşîna Amanoz (Ceylan Yaşar) di rojnameyê de cihê xwe digire.



Zehra Mohammedzadeh

## Çûka biçûk Tûrqê

Stran û muzîka kurdî xwedî aheng, melodî û taybetmendiyên cihê ye. Li ser her diyarde, zindî, xweşî û nexweşî, mirin û jiyân, zilm û zorê, jinê û tiştên bi serê wê de bihuriye, bi rengê xweş hatiye bilêvkirin û gotin. Her bûyer û rewşa hatî jiyîn, li gor dem û çaxa tê de bi rengê dangan tomar kiriye û ji serdemekê ber bi serdemekê din ve herikandiye.

Lê belê tişteke din jî ku pir xweş bi lîv kiriye û di nav hevsgengiyekê de pêre jiyaye, bi hemû taybetmendiyên wê aniye ziman jî xweza ye. Di stran û muzîka kurdî de (di zaravayên cihê yên kurdî de) xweza bi awayê herî xweş, bedew û di nav hevsgengiyê de hatiye bilêvkirin. Bi hostayî her xweşkahî, deng û rengê ji xwezayê bi rêya dangan hatiye resmandin. A rast dengbûna rehik û reng ji xweşkahiyên ji dilê xwezayê qut dibin û diherikin. Her wiha nêzikatiyek rast a ji xwezayê re, dîsa baldariya wê û girêdana bi dayikê re jî mirov dikare di gelek stranên kurdî de bibîne. Muzîka Tûrqê jî yek ji wan

stranan e ku mirov dikare li vir mînak bide: Muzîka Tûrqê yek ji muzîka dilniya ye, bi nav û deng û pir tê hezkirin. Ev muzîk a kurdên bakurê Xorasanê ye û ji aliyê wan ve hatiye xwendin.

Çîroka çûka biçûk Tûrqê dûr û dirêj e, ji bo wê jî em ê hewl bidin bi gotinên xweş, bijare û bikêrhatî ve çîrokê ji we re di nav deryaya hestan de bihûnin.

Tûrqê çûkek biçûk e ku di nav zeviyan genim ên bakurê Xorasanê de jiyaye. Ev çûk piştî ku hêkên wê dişikên û dûvre demdirêj li çêlikên xwe dinêre şûnde, firîne hîne wan dike û ev stran jî li ser kêliya ku çûk firîne hîne çêlikên xwe dike, hatiye gotin. Çûk di ezmûna xwe ya ewil a firîne de difirin, kêliyêk kêmi di asîman de dimînin û dûvre dikevin erdê, lê di ceribandîneke din de kêmekê bi bask dibe, di dawiyê de careke din diceribîne û bi yek carê difire. Bi vê firîne re ew ê ji bo heta hatayê ji maka xwe qut bibe.

Jixwe destpêka muzîkê bi ketina çêlikan re hevrê e, bi perîna wan re jî digihê lûtkeyê. Ev muzîk li cihekî bilind dibe ku êdî çêlik di

ceribandîna xwe ya dawî de bi per û bask dibe û beriya bifire ji maka xwe xatir dixwaze. Aliyekî ve stranê kêyfxweşiya firîna û serketina çûkekê radigihîne, aliyê din jî dixwaze xema makekê ku wê ji bo heta hatayê ji çêlikên xwe dûr bikeve radigihîne.

Her wiha gelek şroveyan mîstîk ên ve muzîkê jî hatine pêşkêşkirin. Jixwe tê gotin ji bo kesên muzîkzan ên bakurê Xorasanê, Tûrqê çûka herî hezkîrî ye. Ev çûka bextewar a ku dixwaze serdena cemelê yar bike, gelek tiştan û li ser gelek eşan hezar û yek navên xwedawendî fêr dibe û hinkirinên epîstemolojîk bi kar tîne, heyanî welatê hevalê xwe difire û dibe didarek ji cemelê yar.

Li gor hin lêkolînan jî, di hin baweriyên din de, Tûrqê wek balinde hatiye pênasîkirin ku di qesra Silêman pêxember de amade bûye û ji rehmeta Silêman sûd wergirtiye. Ev balinde ji her demekê zêdetir evîndar û hesreta dîtina yarê bûye.

Tê gotin Silêman bi wî fêr dike ku ji bo gihîştina yarê lazim e

tune bibe û divê ji sifirê dest pê bike. Yanî xwe ji nû de bixuliqîne. Tûrqê jî bi bal û bask dibe, baskên xwe digihîne hev û bi her vekirina baskên xwe re navek ji xwedawend tîne ziman, ev firîna jî heya gihandin û dîtina cemelê rêheval wê bidome, lê di kêliya bigihe nûraniya cemel, di gotina hezar û yekemîn nav de disekine û dikeve. Ev hewldan gelek caran didome, heya ku di her firîne de perek ji pelên wî diweşin. Ev yek ev çend didome ku êdî perek ji bo ku Tûrqê pê bifire, nemîne.

Hevsengiya xweş, melodî û aliyê ve çîroka mîstîk ku bi hunera muzîkjenên bikêrhatî re dibe yek, dihêle ku muzîkek wiha xweş pêk bê. Bi aliyê xwe ve efsûnî û mîstîk nepenîtiyekê dide muzîkê, dihêle ku mirov li pey ve ahengê biherike. Ewqas biherike heya ku mirov jî bigihe ew raza di nav ve ahenga gerdûnê de veşartî ye.

Helbet girîng e ku mirov bibêje; muzîka Tûrqê yek ji çend stranên herêma bakurê Xorasanê ye ku bêgotin e, tenê muzîk e. Her wiha ev muzîk bi dutar û amûra bi navê Qoşmê tê lêdan.

Mizgîn Ronak

## Lênûskên winda!

Demek berê "lênûskên winda" wekî îşaretêkê ketibû bîra min, çî dinivîsand xwe tê de dida der lê lînûskên min winda nebûn. Niha çar lînûskên min bi rastî jî winda ne. Hezar mixabin, çar lînûskên min ên helbestan, ji hêla Gestapoyên TEM'ê ve hatin desteserkerin û niha di îşkenceyaneyên dagirker û asîmîlasyonîst de dizarin!

Dengê her rîsteyê tê guhên min. Kurdî ne, dil-dar in, rûpak in, kulîlk in, can in, stêrk in! Sozdar im ku wan ji wir rizgar bikim. Carna dibêjim, berxwedan û serberziya li hemberî dewletê êdî ne tenê karê partî û rêxistinê ye. Em hemû kes jî wekî kirde muxatabên berxwedan û serberziya li hemberî faşîzmê ne. Ev Doz êdî ya kesani ye jî; bê nasnameyên me yên dîrokî û rêxistinî jî dişuxule ev doz û li gel wan jî dişuxule. Ango her kes kirde ye divê meseleyê de, her kes gere heyfa xwe nehêle wekî ku anarşîst dibêjin; "Civaka ku bûye kesani" ye. Jixwe ku kes bibin kirde, civak hingê dibin "civak", an na ferqa hebûnê, ji ya garanên bê vîn û bê kirde yan jî yek kirde namîne.

Niha di vê şeva zivistanê ya dûr de ez pir bêriya wan lînûskan dikim, her riste dizimzime li bîra min lê ne gengaz e ku wan ji ber bixwîn an jî ji nû ve binivîsim. Lew helbest bûyerek firyar e; ne bi lêkolîn û qeydan pêk tê ne jî sînor nas dike. Wan lînûskên winda, wekî çarenûsa kurdan diêşin niha, li ber dilê naveroka xwe ya kurdî didin

Wekî ku ji min re dibêjin; "Te em nivîsandin lê nekarî, me biparêzî, xelas biki." Rast e jî. Mixabin em hemû ne wek hev bin jî tu kes ji me azad nîn e yan jî azadî heta digihîje ber tank û pêlavên wan, diqede û ev mesele ne tenê bi bindestbûna welat ve girêdayî ye. Mirovên xwedî dewlet jî ne azad in. Berê faşîzma tirk bi pirani li hemberî kurdan bû, ji bo ku em kurd "terorîst" dihatin dîtin jî xema kesê nebû lê niha tank gihîştine ber derê her kesê û polîs li hemû deriyan dixin, dişikînin. Êdî faşîzm li her derê ye. Her çîqas ku zanî û helwestek dijwar dernekeve jî her kes hîs dike ku tu ewlekarî û mîsogerîya wê/tî tune ye û ev yek, bi eynî awayî nebe jî; li hemû dinyayê jî heye. Yanî azadî çîqas diçe durtir, qelstir û nepêkantiyê dibe. Loma jî li gorî min tîgîna "azadiyê" jî giyan û naveroka xwe diguherîne, gere biguherîne jî. Mînak; êdî azadî ne bi xwedîbûna dewletê ne bi mezinbûn û xurtbûna rêxistin û organîzasyonan e; her kes ve dibîne. Bê bihevrebûn û armancbûnê nabe lê wekî berê meseleyek wisa hêsan nîn e.

Welhasil digel vê jî em ji hev cuda ne û ya ku lînûska wê winda ye ez im, ne hûn! Ya ku di lînûskên wenda de helbestên kurdî yên ku niha zarîna wan diçe asîman nivîsandiye û nekarî biparêze ez im, ne hûn, lê dîsa jî soz didim zimanê me û helbestê dê ew helbest rizgar bibin! Niha ji rîka gestapoyan ve bi çend rîsteyên kurdî, silav didim bêkesiya lînûskên xwe: "Simbala genimê bû zevî/lê xewa te neket çavên min/her û her şiyar man"

Lînûskên desteserkerî wekî gustîlek ku ji destê dawî ketibe binê bîrek bêbînî, dizimzimin di dilê min de. Li zora min diçe her tişt wekî çawa ku dema biraziya min a hêja Elend ji neçariyê diçe dibistana tirkî û pênoşî û serkeftinên xwe yên ewil bi tirkî dijî, li zora min diçe lew me ji zarokê wiha ku wekî çawan ji tirkî hat parastin û bi du zaravayî (kurmançî û dimilkî) mezin dibe re (û ji tevî yên wekî wê re) dibistanek jî amade nekîr, ji me nehat! Tevî şer, berxwedan û şehadetên bêhempa jî hêj zarokên me bîdibistan in û em xwe nexapînin; ev sûc ê me ye! Lew neyar ji xwe neyar e.

Dizanîm Elenda min asîmîle nabe lew dibistana girîngtir malbat e. Ger lînûskên min hebûna min ê niha ji we re ji wir helbestan binivîsanda lê niha tenê ev riste hene! "Stêrk şibakên asîman in/em nizanin di hundir de kî hene/tenê ronahiya şibakan dibe para me/em hev ji îsyana helbestan dinasin/li ser ewran/li bin keviran/helbest ronîya stêrkan e/em wan tenê ji dûr ve dibînin/ji roniyên dûr/bi roniyên dûr hev dinasin/axîna helbestan û şîreşîra hespan/bi pey me dikeve/em hev ji helbestên bêxew nas dikin/dûr e her tişt/stêrk e/em hev ji bêxewiya helbestan/nas dikin/stêrk stêrk/li dûr diçirsin hes nizane kî û çî heye/li wê dûrîya ebedî.

# Birîna vekirî ya 9 salan

Navenda Nûçeyan

Di şeva 28'ê Kanûna 2011'an de li gundê Roboskî yê navçeya Qilebanê ya Şirnexê, dewletê rûyê xwe yê hovane û qetilkar, careke din nîşanî kurdan da. Balafirên Hêzên Çekdar ên Tirk (TSK) di vê şevê de bombe li 34 welatîyên kurd barandin û hemû qetil kirin.

Dema ku ev komkujî pêk hat, weke bûyerên bi vî rengî yê demên berê, dewletê bi saetan veşart û nexwest bê bihîstin. Li gel ku dimênê wehşata ku pêk hatibû, ji aliyê çapameniya azad ve dihatin parvekirin ji çapameniya tirk xwe li kerbûn û lalîyê danibû û bi tu awayî bûyer ji raya giştî re ranedigihand.

### Bi kurdekî hovîtî ragihandin

Piştî ku wehşet di çapameniya cîhanê de weke nûçeyên lezgin derbas bû, dewlet neçar ma ku hovîtîya xwe ya li hemerî welatîyên kurdan qebûl bike û bi siyasatmedarekî AKP'î yê kurd der barê mijarê de daxuyanî bide. Ev kes Huseyîn Çelîk bû ku niha ji AKP'ê hatiye dûrxistin û destûr nayê dayîn ku bi awayî dengê wî bê bihîstin. Bi gotineke din rola ku jê re hatibû diyarkirin îro bi dawî bûye.

### Xwestin ser komkujîyê bigirin

Piştî ku komkujî hat qebûlkirin û qaşo ji bo kujeran sozên cezakirinê hatin dayîn jî heta niha tu kujer nehatiye darizandin û cezakirin. Berovajiyê cezakirinê kesên ku destê wan di vê komkujîyê de hebûn ji aliyê serokomar Recep Tayyîp Erdogan ve bi payeyên bilind hatine xelatkirin.



Di ser Komkujîya Roboskî de 9 sal derbas bûn û hê jî kujerên komkujîyê li ser kar in û bi tu awayî nehatine cezakirin. Ji bo qurbanîyên komkujîyê bernamêyên bîranînê hatin lidarxistin

Pêvajoya hiqûqî ya hesabpîrsîna vê komkujîyê ji aliyê AKP'ê ve hat xwestin bi pereyan bê bidawîkirin. Ji bo vê yekê AKP'ê mîqdarekî pere pêşniyarî malbatan kir û ji wan xwest ku bi vî mîqdarî qanih bibin û li dijî dewletê doz venekin. Malbatên kezebşewitî yê qurbanîyên komkujîyê li dijî vî teklîfa AKP'ê derketin û doz li dewletê vekirin.

### Kujer li ser peywira xwe ne

Piştî vî jî pêvajoya hiqûqî bi zanebûn hat dirêjkirin û gelek astengiyên burokratîk jê re hatin derxistin. Herî dawî jî di sala 2016'an de Dadgeha Destûra Bingeîn a Tirkîyeyê, bi hinceta ewraqên kêr serlêdana ku ji bo komkujîyê hatibû kirin, red kir. Li gel ku ev

biryar gelek hat rexnekirin jî dadgehê ji bo qebûlkirina serlêdanê û darizandina kujeran tu gav neavêt. Piştî redkirina dadgeha destûra bingehîn, parêzeran serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) da. Vê carê jî sala 2018'an DMME'yê bi hinceta parêzeran belgeyê ji wan hatiye xwestin du roj dereng şandine, serlêdan red kir.

Di ser hovîtîya dewletê re 9 sal derbas bûn. Hê jî di pêvajoya hiqûqî ya komkujîyê de tu pêşveçûn tune ye. Kujerên ku ji aliyê serokomar Erdogan ve hatine xelatkirin, li ser peywira xwe ne û ji bo têkbirina destkeftiyên kurdan di nav amedekariyan de ne. Hem beriya salvegera komkujîyê hem jî piştî salvegera komkujîyê ji aliyê gelek sazî û dezgehên

kurdan ve têkildarî Komkujîya Roboskiyê daxuyanî hatin dayîn û komkujî hat şermezarkirin. Di daxuyaniyan de qurbanîyên komkujîyê hatin bibîranîn.

Bernameya girseyî ya bîranînê ji aliyê HDP'ê ve li gundê Roboskî cihê ku komkujî lê çêbûbû, pêk hat. Hevseroka HDP'ê Pervîn Bûldan û gelek parlamenterên partiya xwe tev li bernamêyê bûn û qurbanîyên komkujîyê bi bir anîn. Pervîn Bûldan, li vir der barê komkujîyê de axivî û diyar kir ku dewlet û hikûmetê bi zanebûn û bi xwestin bombe bi ser qurbanîyan de barandine.

Ji aliyê desthilata AKP'ê ve têkildarî komkujîyê tu daxuyanî nehat dayîn û çapameniya wê jî bi tu awayî cih neda komkujîyê û bernamêyên bîranîna qurbanîyên wê.

## Li dijî tecrîdê berxwedana girtiyan mezin dibe

Navenda Nûçeyan

Girtiyan ji doza PKK û PAJK'ê girtî yê di girtîgehên Tirkîyeyê de bi daxwaza rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27'ê Mijdarê de dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin.

Çalakiya girtiyan bi koma 8'emîn di meha duyemîn de didome. Her diçe hejmara girtiyan ku beşdarên çalakiyê dibin zêdetir dibin. Rexmî vî rewşê jî desthilata AKP'ê xwe ji çalakiyê re ker û lal kiriye û tu daxuyanî nade.

### Îzolasyon kûrtir dibe

Li şûna rakirina tecrîdê, îzolasyona li Îmraliyê kûrtir dibe. Nîşaneyê vî yekê jî bi astengkirina şandina pirtûkan a ji bo Ocalan derket holê. Pirtûkên ku parlamenterê HDP'ê Kemal Bulbul ji Ocalan re şand ji aliyê dewletê ve hatin astengkirin.

Bi zêdebûna beşdarên û dirêjbûna berxwedanê re zext û zilma li ser girtiyan çalakger jî zêde bûn. Ji gelek girtîgehên agahiyên ku mafên girtiyan tên binpêkirin û îşkenceya li wan tê kirin, hatin.

Çalakgerê grevê Mehmet Sidik Baran, ji Girtîgeha Tîpa L a Kalkandereyê ya Rîzeyê, ji malbata xwe re ragihand ku dema dertên axaftina bi telefonê lêgerîna tazî li wan tê ferzkirin.

Bavê berxwedêr Baran, Temîn Baran li dijî vî pêkanîne derket û destnîşan kir ku pêkanîna lêgerîna tazî pêkanîna Esat Oktay Yıldırım e û got ku ew heta dawiyê piştigirîya zarokên xwe dikin.

Endamê Meclisa Ciwanan a HDP'ê jî bo piştigirîya çalakgerên greva birçîbûnê qertan ji girtîgehên re şandin. Ciwanan di qertan de peyamên piştigirîyê ji bo girtiyan nivîsandin û serkeftin ji wan re xwestin.

Komeleyên Piştewaniya Malbatên Girtî û Hikumxariyan jî di nav hefteyê de ji bo çalakiya greva birçîbûnê daxuyanî dan û banga bihîstina dengê girtiyan û qebûlkirina daxwazên wan li desthilata AKP'ê kirin.

## Zrîngê Kalo bi girî vekir!

Navenda Nûçeyan

Hejmara 10'emîn a Kovara Zrîngê ya mehê carekê derdikeve çap bû û bi naverokeke tîr û tije gihîşt ber xwînerên xwe. Berga kovarê ya ji aliyê xêzkara jin Rûşen Sarili ve hatiye xêzkirin, balê dikişanîne ser sala nû û xizaniya li Kurdistanê. Gelê kurd serê sala bi lîstikên kalo û pîrê, bûk û zava, kosegerî û hwd. pîroz dike.

Xêzkar Sarili, rewşa heyî ya xizaniyê bi kaloyê sersalê yê diyariyan belav dike vedibêje. Kaloyê ku sersalê pîroz dike ji ber xizaniya li Kurdistanê xemgîn dibe û heta cil û bergên xwe diyarî dike.

Di vî hejmarê de; nivîskar Azad Kûtî bi meselokên xwe, Rûşen Sarili bi rûpela xwe ya 'Kundirlop', Eşref Mumcu bi karakterên 'Melle', 'Dikê Qoqo', 'Sosretik', 'Tabletên Beredayî', 'Evînen Sist', 'Mehlûqatên Eşref Mumcu' û 'Tirşik', Şêx Zubêr bi nivîsa xwe ya 'Lome û Dîplome', Sadiye Deniz Eser bi xêzên xwe yê 'Jiyana Nedîtî', Erçeren Akbayir û Kubîlay Odabaş bi xêzên xwe yê rojevî û mîzahî, Ikram Balekanî bi nivîsa xwe ya 'Ma we dizanî!', nivîskar Mehmet Erbey û xêzkar Mustafa Yaman bi karekterê 'Xeto', Ozgur Amed bi nivîsa xwe ya 'Xidir na lê Xizir bila bi me re bel!', Xêzkar Mustafa Yaman bi xêzên xwe yê rojevî, xêzkar Bunyamîn Karakoç bi karakterê xwe yê 'Ehmed', Eliyê Xemxwir bi serpehatiyên xwe, Üsiv Mele bi 'Teşqe' yê xwe, Mem Aliyê Kamûr bi balkişandina ser zimanê jiyaniyê Amedê, xêzkar Hebûn bi karekterê xwe yê 'Belengaz Behrî', Mij û Dûman bi 'Radyoya Bêsansur', xêzkar Michael Erdman bi 'Pisîka Qelew', ji zindanê Îsa Bal û xêzkar Ercan Altûntaş jî bi portreyên navdarên kurd di vî hejmarê de dertê pêşberî xwînerên xwe.

Di vî hejmarê de Sadiye Deniz Eser, Eliyê Xemxwir, Üsiv Mele, Îsa Bal û Ercan Altûntaş cara yekemîn e di kovarê de cih digirin.

Kovarê her wiha ji bo eleqeya li çand, ziman û wêjaya kurdî, cih daye pêşbirkekê jî. Di nivîsa amadekirina pêşbirkekê de wiha tê gotin: "Xwînerên heja ji bo eleqeya li çand, ziman û wêjaya kurdî ji niha û pê ve em ê di her hejmarê de cih bidin vî pêşbirkekê. Kî pênc (5) pîrsên me biber-sivîne û heta 20'ê mehê bi mailê ji me re bişîne, dê bi pişk kişandinê ji bo yê ku navê wî/ê derketî pirtûkeke kurdî û ji bo 5 kesên bi heman şewazê navê wan derketî jî hejmara nû ya Zrîngê diyarî bê dayîn."

Li aliyê din jî kovarê de ji niha û pê ve di her hejmarê de cih bide portreyên navdarên kurd. Di vî hejmarê de jî bi xêzên Ercan Altûntaş cih daye portreyên Eyaz Yûsif û Erdewan Zaxoyî.



TMMOB Şaxa Odeya Endezyarên Elektrîkê ya Amedê



# EM ÊŞÊN XWE DIXEMILÎNIN Û BI SLOGANAN VEDIBÊJIN

## Romanên bextewar tune ne

### ■ Xecê Daşxin

*Em bi nivîskar û helbestvan Nûdem Hezex re li ser edebiyata kurdî û romana wî ya dawî 'Spîroj'ê avixîn. Hezex têkildarî edebiyat û zimanê kurdî, agahiyên girîng dan.*

**Ez bi gotina te dest bi pîrsa xwe bikim, "Kitêb ji bo fêmkirinê yan ji bo hîskirinê tîn xwendin?" Tiştê em dizanin, derdekî nivîskaran heye û dixwazin bîn fêmkirin. Çi ye meseleya fêmkirinê û hîskirinê?**

Hin kitêb ji bo fêmkirinê, hin kitêb jî ji bo hestkirinê ne. Mînak; kitêbên dersan, dîroka, lêkolîniyê, ansîklopedî û ên rêzîmên ji bo fêmkirinê ne; lê roman, helbest û hwd. bi ji bo hestkirinê ne. Hestkirin, dikare tiştan bi mirov bide fêmkirin; lê fêmkirin, nikare tiştan bi mirov bide hestkirin.

Em li tîkîlîyên edebiyat û sînemayê binêrin, em ê hê baştir karibin mijarê fêmkirinê. Ka em bipirsin, çima filmên romanên hene; lê romanên filman nîn in? Eger em li ferqa di navbera xwendina romanê Dostoyevskiyê û temaşekirina filmeke romanê Dostoyevskiyê binêrin, em ê hê baştir bersiva pîrsa "roman çi ye?" bidin. Li sînemayê, operayê, muzîkê û şanoyê jî ziman heye lê ziman li wan qadan ne bi tenê ye, gelek tiştên di jî bi wan re hene. Li edebiyatê bi tenê ziman heye, ji zimên pê ve tişteke di nîne. Loma li edebiyatê tiştê herî muhîm ziman e. Ji çîrokê û tevne muhîmtir e. Mirov dikare dîtbarîyan, xwiyangan, dîmenan resim û fotografan binivîse lêbelê hêmayên hin nivîsaran (helbest an roman) nakeve çerçoveyan, nayên rismandin, nabin dîtbarî, xwiyang an dîmen.

Gava mirov wergera berhemekê ya ji aliyê du kesan ve hatî kirin bixwîne baştir fêmkirinê zimanê qasî muhîm e. Mixabin hin kes romanê bi tenê "vegotinê çîrokê" ya kronolojîk dihesibînin û weke senaryoya filmê li romanê dinêrin. Ma pêkan e filmên romanên, bi qasî romanên serkeftî bin.

**Gava romana te ya xelatgirtî - Bîrderket gelek niqaş çêbûn. Hin kesan got, "di romanê de bûyer tune ye, nayê fêmkirin" hin kesan jî gelekî pesnê Bîrê da. Piştî Bîrê, di romana te ya nû de motîvasyona nivîsandina te çi bû?**

Li Bîrê jî hêla teknîkî û zimanî ve gelek ceribandin hebûn. Ceribandina herî zor û zehmet nixumandina "çîroka esasî" bû. Nivîskar, bi piranî "çîroka esasî" derdixin pêş; lê li Bîrê rewş vajî bû, "çîroka esasî" hatibû nixumandin. Belê "çîroka esasî" nixumî bû û ji afirîneriya xwendê re qadeke fireh hiştibû. Xwendêyê jîr, lehenga romanê ya esasî LA'yê bi afirîneriya xwe kifş dikin û

dikevin pey aşopiyên wê, aşopiyên wê eşqa nehatî vegotin û wê pîrsê dîke: "Jineke tirk çima fêrî kurdî bibe û zimanê bavê kesekî, fêrî kesekî bike?"

Teybetmendîya Bîrê a herî darîçav ew bû: Xwende "ehmeq" nehatibû hesibandin. Xwende "bi aqil" "afirîner" hatibû hesibandin. Jixwe û loma xwendeyên aktif, afirîner û xeyalperest jî Bîrê gelekî hez kirin. Di romana nû - SPÎROJÊ- de jî çîroka esasî ne li pêş e, li pişt perdeyekê ye. Dîsa leheng tev "kesên ji rêzê" ne. Dîsa bûyer û mijar ji heyata "zindî" ne; realist in û dîsa ziman, zimanê bi ekolojîya xwe ye. Di romana SPÎROJÊ de, ji hêla bikaranîna zimên ve -zimanê em dixwazin bibe zimanê civakî- zêdetir hatîye darîçavkirin û raxistin. Mînak; ji bo hevokazîyê zelaltir a tîr bi xal û bend û bi hişmenda kurdî xebateke teybet hatîye kirin.

Motîvasyona min vî carê baştir bû ji Bîrê. Çikû min bi romana Bîrê dît; nivîskar, çapemenî û weşanxaneyên kurdî qîmetê nedin "tiştên nû" jî, qîsmekî xwendeyan qîmetê didin tiştên nû, tiştên cihê. Na, na, ti caran weke lîstikvanê fitbolê yên ji bo refleksên tribûnê diilîzin naxwazim tev bigerim. Qet neyê fêmkirin jî li gorî xwe dimeşim, israr dikim.

Bi zimên mirov dikare bimeşe, bibeze, raweste; lêbelê dikare akrobaşîyan jî bike. Dibe mirov nikaribe "tişteke nû" bibêje; lê mirov dikare bi "şewazeke nû" tişteke kevin jî nû bike, bi teşeyê nû vebêje. Her çî qasî hewce be nivîskar bi "zimanê civakî" binivîse jî divêti ye ew "zimanê xwe" bi-afirîne û hin teybetmendîyan li "zimanê xwe" bar bike. Gringîya xwebûnê gelekî zêde ye ji bo min, sirf ji bo mirov jî min hez bikin tavîzan nadim ji ve tevgera xwe. Ne şaş bim C. Şehabedîn gotibû, "Kesê tişteki nede xwendeyan ne nivîskar in, ew katib in." Helbet ez naxwazim bibim katib.

**Tiştê min dîtî; tu di berhemên xwe de ji peyv û rûpelan tesseruf dikî, gelo ez bibêjim îdiayeke te heye tu dibêji "kurt û kupkurancî jî" edebiyat mimkûn e?**

Şert û mercên jiyana îro ne yên berê ne. Loma hunera îro konsantre ye. Çîrok mînimîmal in, helbest kin in. Jixwe wextê mirovan nîne bi taswîrên xemilandî û xemilandî yên bêwate wextê xwe serf bikin. Di vê romana nû de jî min nexwest rûpelên wê zêde bin. Belê, divê mirov jî peyv, hevokan tesseruf bike. Tu çî qasî şîr bikelîni, mastê wê jî ew qasî xweş dibe. Çima ji bo gelek bixwîyê ez avê tevî şîrê xwe bikim?

Pirsgirêkên zimanê kurdî gelek in û mixabin bi van pirsgirêkan edebiyateke baş zaf zor e. Him zorê dide nivîskar him jî dide xwendeyan. Heya sazî, weşanxane, zimannas, nivîskar civakîkirina

Bi qasî ez dibînim tevgerên diqewimin, zimanê me tune dikin. Ji hêlekê ve hişmendîya tirkî jî hêlekê ve soranîkirin û herêmîkirin, rojbiroj zimên şeht dikin. Ji dêvla em bîst wergerên ne baş bikin, wergereke baş bikin ne çêtir e?

zimên li pişt xwe nekin bar, ev pirsgirêk çareser nabin. Loma ez behsa vîzyona "kupkurancî", behsa kurmançîya bi kurmançî dikim û dixwazim mimkûnbûna wê darîçav bikim. Sereke sedema nivîsandina min ev e; dixwazim bibêjim va ye zimanekî kupkurancî û ev ziman dikare tîra nivîsbêjiyê bike. Îcar nizanîm çî qasî serkeftî dibim.

**Li gorî te edebiyat ji bo xurtbûna zimên çî bar hilgirtîye ser milê xwe?**

Bi qasî ez dibînim tevgerên diqewimin, zimanê me tune dikin. Ji hêlekê ve hişmendîya tirkî jî hêlekê ve soranîkirin û herêmîkirin, rojbiroj zimên şeht dikin. Ji dêvla em bîst wergerên ne baş bikin, wergereke baş bikin ne çêtir e? Em şaşîyê ecêb dikin: Edebîyata xwe bi edebiyatên zimanên cihanê re qiyas dikin! Şert û mercên her zimanî cihê ne. Zimanê kurdî di qada edebiyata nivîskî de qadeke beyar e. Loma ne hêsan e mirov çandîniyê li erdeke beyar bike. Divê mirov çend deman cot bike, ji kevir û latan paqij bike. Zimanê kurdî, hê li nivîsbêjiyê nebûye zimanekî civakî loma mirov nikare pê her tiştî bike. Hin bikaranînan wê yên ne darîçav nînin, tu cara ewil bi kar tîni. Barekî gran li pişt nivîsbêjan e, ji bo wê qadê jî beyartîyê bibin çandîniyê. Divê her nivîskar, hin tovan biçînin ji bo beşeyekî edebiyata kurdî hebe û em ji beşeyî fêkîyan bixwin. Weşanxane çî dikin, bi piranî li zimên û nivîsbêjiya kurdî ranawestîni; di nav xwe de videoyan qeyd dikin, hevpeyvînan dikin û pesnê hev didin, youtuberîyê dikin, ticaretê dikin. Tu li kitêbên wan yên çapkirî dinêrî, ne redaksiyon ne mantik ne vîzyoneke zimên. Li cem me dibêjin, "tu bavêjî ber seyan jî, se naxwin." Kitêbên wisa çap dikin. Kitêb in, lê ne berhem in.

**Her berhemekê nû, daxwaza gotîneke nû ye (wî tiştî dikare nikare ev meseleyeke din e) tu bi wê berhema xwe ya nû, dixwazî çî li edebiyata me zêde bikî?**

Sedema nivîsbêjiya min jî jixwe ew e: Tişteke nû bibêjim! Baş an nebaş, serkeftî an ne serkeftî; lê li dema nû, tişteke nû bibêjim. Nikaribim tişteke nû bibêjim jî bi teşeyê nû bibêjim. Belkî gavên diavêjim bi qasî dilopeke avê ne ya li deryayê zêde dibe, belkî bi qasî libeke qûmê ye li çolekê berba dibe, lêbelê ez wan gavan weke şoreşekê bi qîmet dibînim. Her çî qasî bizanibim, tiştên nû jî piştî demekê kevin dibin. Ji bo Bîrê hîn kesan got, ji bo balê bi ser



xwe de bide KU'yan bi kar nayîne. Ma bi tenê nebûna gihanekekê ye zimanê Bîrê? Ji raveksazîyê heya hevokazîyê, peyv bi peyv, tîp bi tîp xebateke zimên heye. Belkî ked tîrê nekiribe, lê xebitîme. Ji mîroyekî di rêya hecê de dipirsin, dibêjin: "Ne mimkûn e tu bigihî Kabeyê, çima tu belesêbe xwe diwestîni?" Mîro bersiv dide, dibêje: "Hema negihîjim jî, di wê rêyê de bimirim ji bo min serkeftînek e." A min jî ew mijar e. Heya bimirim ez ê divê rêyê de bixebitîm.

**Îro di edebiyata kurdî de, di navbera romana duh û îro de cihêtiyek heye, çawa dibîni, heke erê be çî ye?**

Ez ne xwendeyekî baş im, lê bi qasî dişopînim romanê êdî ne "efsane" ne. Edebîyatê êdî "guvaştî" ye. Konsantre ye. Ji romanên çendek "Aforîzma" dimînin û hew. Belkî jî diyalogek an navê lehengekî. Êdî Don Kîşot nînin, lehengên wê demê weke "Mihemedê Dilşûşe" belengaz in. Mixabin em edebiyata cihanê herî kêm sed salan bi şûn de dişopînin. Mînak, van bîst salên dawî, heta pêncê salên dawî jî edebiyata Rûsyayê me çî xwendîye? Em çî dixwînin? Di vê navberê de dixwazim vê jî bibêjim, ger edebiyata kurdî bi dev û ziman bibe dikare weke edebiyata rûsan a berîya du sed salan dinyayê bi-hejîne. Ew potansiyel heye. Ew mijar û çîrokên me yên bîn nivîsin, bîn xwendin hene û zaf in.

**Li ser gotina te ya dawî tişteke bipirsim. Ew potansiyela heyî, ew mijar û çîrokên nayên nivîsandin sedema nenivîsandina me tenê ziman nîne ne wisa?**

Mijareka pir berfireh e, lê gotina te pîrseke din anî bîra min: Ji bo edebiyateke baş ji xeynî ziman çî lazîm e? "Êş" jî lazîm e. Çîrokên êşê jî lazîm in. Rûsya berîya du sed salan çima dinya dihejand bi edebiyatê? Sibîrya hebû, çar hebû, şer hebû, Bolşevîk hebû. Romanên bextewar tune ne.

**Êş, hiç li me kêm nebûye; lê dîsa jî em nikarin bibêjin tîra xwe bi kêrî edebiyata me hatîye. Gelo em nizanin êşa xwe bibêjin?**

Belê em nizanin. Em êşên xwe dixemilînin û bi sloganan vedibêjin. Ez ji te bipirsim, ma êş tîn xemilandin? Em xitabî tribûnên xwe dikin, xitabî dinyayê nakin. Mînak, em dibêjin: "Romana min

behsa şerê xendekan dîke." Yanî tu vegotina xwe ji "şerên xendekan" re nakî fon, tu "şerê xendekan" ji vegotina xwe re dikî fon. Dibêjin "romana dijkolonyalist" fikreke seqet e. Roman ne li dijî tişteke ye an aligirê tişteke. Nivîskar dijkolonyal e an na, ne roman. Mirov ji bo dijkolonyalist be romanê nanivîse, mirov dinivîse û ew nivîs dibin dijkolonyal.

**Çawa dibe ewqas nivîskar (hemû fikr û nêrînen wan ji hev cihê) hemû eynî tiştî, eynî şewazê di berhemên xwe de bikartînin?**



Çikû fikir û nêrînen wan ji hev ne cihê ne. Bi tenê eşret cihê ne. Tişteke di jî heye: Jêderka wan eynî ye, eynî kitêban dixwînin. Bandora heman kesan li ser wan heye, ne xwe ne, nabin xwe loma. Marquez in, Kafka ne, Dostoyevskî ne; lê ne "xwe" ne.

**Ev nav, nivîskarên dinyayê li hemûyan kêm zêde bandorê dikin, pirsgirêkê bera jî ev e gelo?**

Helbet bandora wan heye, lêbele W. Wolf kes teqlîd nekirîye ne gotîye ez jî weke bêvankes binivîsim. Li hemû nivîskarên bi nav û deng binêrî hemû xwedî kesayîtiyekê ne, teybetmendîyekê ne. Pêşvanên rêbazekê ne. Em çî dikin? Dibêjin Marquezê kurdan, W. Wolfê kurdan û...

**Te him helbest him jî roman nivîsîne, tu xwe helbestvan dibîni yan nivîskar?**

Ez ji qada muzîkbêjiyê piştî 45 salîya xwe bûrîme qada edebiyatê. Zimanê min gelê min e û ez hozanê gelê xwe me.



## Nûdem Hezex kî ye?

Nivîskar, helbestvan Nûdem Hezex di sala 1965'an de li Hezexê ji dayîk bûye. Di sala 1989'an de Beşa Mamostetiya Teknolojîyê ya Zanîngeha Gaziyê qedandîye. 28 salan karê mamostetiye kirîye û niha malnişîn e. Romana Hezex a bi navê 'Bîr'ê sala 2018'an Xelata Wêjeyê ya Ehmedê Xanî wergirt. Meha borî romana nû ya Hezex 'Spîroj' jî aliyê weşanê Payîzê ve hat çapkirin. Berhemên din ên Nûdem Hezex ev in: Xêzimok, Lîflistan û Belalûk.



# Helbestvan û fîlozofê mezin Melayê Cizîrî

Muqades Agirî

Melayê Cizîrî, ne tenê di kurdiya kurmançî de, di çarçoveya edebiyata kurdî tevî de helbestvanê herî girîng tê hesabandin. Di edebiyata kurdî de cara ewil Melayê Cizîrî, li gorî krîterên edebiyata rojhatî, bi taybetî ya Îranê dîwaneke mureteb nivîsandîye. Bi gotineke dî dîwana Melayê Cizîrî, yekem dîwana mureteb a bi kurdî ye ku gihîştîye roja me. Di nav zaravayên dî de jî berî Mela, dîwaneke bi rêk û pêk û mureteb nehatiye nivîsandin. Ev qidema Melayê Cizîrî, cihê wî di tarîxa edebiyata kurdî de bêhempa dike.

Dîwana Melayê Cizîrî ji aliyê çêja edebî, hêz û quweta vegotinê û taybetiyên din ve di nav edebiyata kurdan de di dereceya yekemîn de ye. Di nav ereban de Îbnû'l-Farid, di nav farisan de Hafîzê Şîrazî û di nav tirkan de Fuzulî çî be, Melayê Cizîrî jî di nav kurdan de ew e. Dîwana Mela digel ku yekem e jî di asteke gelekî bilind de hatiye nivîsandin.

Melayê Cizîrî, di edebiyata kurdî de ekola tese-wifê temsîl dike, bi gotineke din ew helbestvanekî mutesewif e, lê digel vê jî ew ne nûnerê edebiyata tekyayê ye. Lewra di dîwana wî de derheqê tekyaya pîrê tekyayê de helbest peyda nabin. Tesawifa li cem Mela, tesawifa felsefî ye ku di dîwana wî de reng vedaye. Xala pêş hizra wehdetu'l-wicûdê (yebûn) ye.

Her çiqas di xezelên Mela de yên şûşane hebin jî bi giştî Mela, di çarçoveya nêrîna tesewifî de, hizra evîna îlahî diparêze, lê mela evîna mecazî jî bo gihîştina evîna heqîqî wekî pirekê dibîne. Melayê Cizîrî, hizra evîna îlahî wekî eşqa heqîqî bi nav dike.

Mela berî her tiştî kesekî mutesewif e. Li gorî kesekî mutesewif jî bo ku ramanên xwe diyar bike helbest nivîsandin hacetê gelek girîng e. Di zî-

Melayê Cizîrî, ne tenê di kurdiya kurmançî de, lê di edebiyata kurdî tevî de helbestvanê herî girîng tê hesabandin, helbestvanê mezin jî aliyê çêja edebî, hêz û quweta vegotinê ve jî di dereca yekemîn de ye

manê helbestan de sembol, hêma jî bo mebestên helbestvan diyar bike hacetê e. Bêguman çanda tesewifê jî ji bo zimanê helbestan musaîd e. Bandora çanda tesewif ya herî girîng ziman, çand û edebiyata gelan bi pêş xistiye.

Dîwana Mela jî di vê çarçoveyê de ji hêla ziman û edebiyata kurdî wekî şaheserekê tê qebûl kirin. Dema ku mirov li dîwana Mela dikole fikrên zanistî û ramanên entelektuel ber bi çav in.

Tevgera edebî ku bi Melayê Cizîrî dest pê kir di nav sofîyên kurd de deng veda û di heman demê de bi fealiyetên terîqatên cuda di nav civaka kurdan de sînerjiyeye mezin pêk anî. Ev jî di edebiyata kurdî ya tesewifê de bû sedema jiyandina qonaxa zêrîn.

Bi bihûrandina salan bi belavbûna îslamiyetê gelek civakên cihê ketin nav dîne îslamê. Helbet ev civak bi tevahî dev ji bîr û baweriyên xwe yên qedîm û çanda xwe ya qedîm bernedan. Ev civak bi tevî çand û bîr û baweriyaya xwe ket nav îslamiyetê. Ji ber vê jî edî tesewif ne wek şeweyek jiyane lê belê şeweyeke felsefî derket pêşberî me. Di nav vê felsefeyê de têgeha herî balkêş têgeha wehdet'ul-wicûdê ye. Ev têgeh bi şîrovevên Îbnî Erebi kete nav teşeyekê. Ev teşe, di nav dîroka tesewifê de hin baweriyên wekî aferîner û aferîde yek in derxist holê lê vê bîr û baweriyê pir qebûl nedît.

Di bîngeha tesewifê de dev jê berdana dinyayê û hezkirina Xwedê heye. Li gorî tesewifê divê mirov dev ji xerabîyan berde û hemû însan di hezkirina xwedê de bibin yek. Li gorî vê baweriyê Xwedê la-yiqê hezkirinê ye. Hewce nake ku em ji xwedê bitir-

sin ji ber ku xwedê afirîdeyê ku hemû mexlûqatan afirandiye û hezkirin hîn wan kiriye. Ji ber vê jî divê hemû însan hezkirinek bêhempa ji xwedê hez bikin. Ji ber vê jî hemû şair Xwedê wek afirîdeyê ku la-yiqê hezkirinê ye dîtine. Di heman demê de li gorî tesewifê divê ku mirov di vê dinyayê de dev ji mal û milkên dinyayê berde û bibe xwedî exlaqek baş, ji ber vê jî divê bi nefsa xwe mirov têkeve nav têkoşinê. Helbet ji ber vê yekê jî lazim e rê û rêbazên tesewifê ji xwe re hilbêjêre. Ji ber van sedeman şairên mutesewif tesewifê wekî rêya rastîn yê îslamiyetê qebûl dikin.

Li gorî tesewifê li ser hemû afirîdeyan hezkirinek mutleq heye û xweşikbûnek mutleq heye. Mirovên ku di vê rê de meşiyane di rûyê hemû mexlûqatan de neqşên îlahî dîtine û hemû qaînat ji bo wan bûye amûrek hezkirina Xwedê. Ji bo ku Xwedê xweşikbûna xwe derxe holê û xwe bide nîşandan hemû qaînat afirandiye û bi vî awayî têgeha eşqa îlahî derketiye holê. Ev têgeh bi sedsalan di nav zimanê edebiyatê de cih girt.

## Berhem, nêrîn û jiyana Cizîrî

**Zanyariyên Nasnameya wî:** Melayê Cizîrî, yekem helbestvanê kurd e ku bi terzê edebiyata klasîk a rojhilatî dîwaneke bi kurdî derxistiye holê. Navê wî yê rastîn Ehmed e. Bi hesab meletiya wî ya di medreseyan de û bajarê wî Cizîrê wekî Melayê Cizîrî hatiye naskirin. Wî bixwe di gelek beytên dîwana xwe de navê xwe emilandiye. Bo nimûne;

*Ehmed im sîne siper pêşberî tîra felekê  
De'wedare te me îro tû ji dehlê were der*

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de bi piranî mexlesa "Mela" bi kar anîye. Ew kesên ku ji medreseyan berê mezûn dibûn û ji wan medreseyan destûrnameya ilmî distandin wekî "Mela" dihatin binavkirin. Îcar Melayê Cizîrî jî melayekî bi vî rengî bû û çawa ku di vê beyta jêrîn de xuya ye, wî di helbestên xwe de ew wesfê xwe ji xwe re wekî mexles xebitandiye.

*Rohniya çehvên Melayî ew tecellaya te dayî  
Ya ji Ehmed dil rewayî dil ji min bir dil ji min*

Wî carinan mexlesa "Nîşanî" jî bi kar anîye ku ev mexlesa wî di duwazde helbestên wî de derbas bûye. Bi qasî ku tû şîrovekirin, Mela bi neqandina vê mexlesê xwestiye îşaret bike ku ew bûye hedefa tîrên evîne, yan jî tîrên mûsîbetan. Her wiha dibe ku emilandina "nîşanî" jî berhebûna nîşana li ser rûyê wî jî be. Wekî nimûne di vê beyta jêrîn de Melayê Cizîrî wekî mexles bêjeya Nîşanî bi kar anîye.

*Qesdê serçeşmeê heywanê heqîqet ke Nîşanî  
Bi cihanê mebe mexrûr ku cihan 'eynê serab e*

Li gorî nusxeya Ebdulqadirê kurê 'Eliyê Amêdî ku di sala 1238/1822'an de hatiye nivîsandin navê bavê Melayê Cizîrî Mela Mihemed e. Dîsa li gorî destnivîsa Omerê kurê Es'ad ku di sala 1937'an de hatiye nivîsandin ew ji malbata Ensariyan e. Her wiha ew ji eşîra Bohtîyan e ku wî bixwe di beyteke xwe de ev tişt anîye zimên:

*Gulê baxê Îremê Bohtan im  
Şebçiraxê şebê Kurdistan im*

## Temenê Mela

Sala jidayikbûn û koça dawiyê ya Mela, di çavkaniyan de nehatiye diyarkirin, lê çawa ku li jorê jî hate nîşandan, ji helbestên Mela bi hesabê Ebcedê jidayikbûn (975/1567-68) û koça wî ya dawiyê (1050/1640) hatiye derxistin. Li gorî ku Elaeddîn Seccadî, ji destnivîsa Ebdulqadir Amêdî neqil kiriye, Mela 75 salan jiyaye. Bi rastî jî li gorî tarîxa jidayikbûn û koça wî ya dawiyê ku bi hesabê ebcedê derketibû holê jî temenê Mela 75 sal çêdibe (1050-975=75)

## Xwendina Mela

Li gorî hatiye rîwayetkirin Mela, li Cizîr, Hekarî, Imadiye û Diyarbekirê xwendîye. Di 32 saliya xwe de, li gundê Strabasê yê Diyarbekirê ji

## Berhemên Melayê Cizîrî

Bêguman Melayê Cizîrî bi dîwana xwe û menzûmeyên xwe yên ji derveyî dîwanê mohra xwe li tarîxa edebiyata kurdî daye. Berhema herî girîng a Mela dîwana wî ye.

Dîwana Mela di tarîxa edebiyata kurdî de yekemîn dîwan e ku bi awayekî mureteb û di asta dîwanên farisî, erebî û tirkî yên navdar de hatiye nivîsandin. Nusxeya Cizîrî, digel helbesta "Ya Ramiye Qelbî" ku bi bal Xizir û Ehmed Paşa ve tê nîsbetkirin 114 helbest in.

\*Qesîde: 21 heb.

\*Xezel: Nûbihar: 87 heb.

\*Medhiye: 2 heb.

\*Rubaî: Di çapa Zivingî de 3 hene.

Digel yên Hartman dibine 16 heb.

\*Tesdîsa Şêx Remezan 1 heb.

\*Terkîb bend: 1 heb

\*Terci'bend: 4 heb.

\*Terdiye: 1 heb.

\*Ferd: 2 heb

\* Hinek helbestên Mela yên neketine dîwana wî jî hene. Bo nimûne, di mecmû'eya Ebdureqîb Yûsif de 2 heb ji wan hene.

Ji bilî van helbestên Mela yên di çarçoveya dîwanê de hatine nivîsandin, hinek menzûmeyên wî yên dî jî hene ku ev jî piştê li dawîya dîwanê hatine zêdekirin û bi dîwanê re di nav yek bergî de hatine çapkirin.

## Terzê Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî, di edebiyata kurdî de nûnerê terzê xezelê ye. Dîwana wî bi piranî ji xezelan pêk tê. Wî hem xezelên rindane, hem yên şoxane, hem yên hekimane, hem yên sūfiyane nivîsandine. Mela di terzê xwe de bi taybetî di bin bandora Hafîzê Şîrazî de maye ku ev bi awayekî aşîkar ji dîwana wî derdikeve holê. Her wiha Mela di dîwana xwe de ji edîben farisan behsa Se'dê Şîrazî û Ferruxî jî kiriye.

Mela Taha îcazet girtiye. Piştê li gundekî din ê Diyarbekirê bi navê Sirba melatî kiriye. Piştê çûye Heskîfê û li wir dersdarî kiriye. Piştê çûye Cizîrê û li Medresa Sor dersdarî kiriye û di heftê û pênc saliya xwe de wefat kiriye û li medreseya sor hatiye veşartin.

Piştî ku Cizîr 30 salan di destê Çelebî yê Akkoyunî de maye, mîrê çardehem Mîr Şerefxan kurê Bedir (...1512) di sala 1508'an de Cizîr ji wî kesî standiye û Medreseya Sor ya Mela tê de medfûn e ava kiriye. Mîr Şerefxan her wiha sê êrîşên Safewîyan jî berteref kirine.

## Zewaca Mela

Li gorî rîwayeta xelkê Cizîrê Mela nezewiciye. Li gorî ku Mela Mehmûdê Bazîdî dibêje Mela aşîqê xweha mîr Îmadedîn bûye. Her wiha tê gotin wî ji keça Melîk Kamilê Heskîfê Selmayê hez kiriye û ev beytên li jêrê derheqê wê de gotine.

*Îde û herkes ji didara te lê pîroz e îd*

*Ez tenê mehrûmê didar im bi sed menzîl be*

*Ma bi le'îlen canfeza navê me bînit carekê*

*Bi'du'a bellix tehiyyatî li Selma ya berîd*

\*Pirtûka Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk Doç. Dr. Abdurrahman Adak r. 228-231-232

\*Dâru'z-Zaman, Dimaşk 2009, r. 212-214; Muhammed Zekî Bervârî, el-Kurd ve'd-devletu' I Osmâniyye,

\*Dâru'z-Zaman, Dimaşk 2009 r. 273-288.

\* Yekta Saraç, Sosyal Bilimler Ansiklopedisi, Risale Yayınları, İstanbul 19" Wehdetu'l- Wicûd"



# Cîhan li pey aşiyê ye

Navenda Nûçeyan

Li cîhanê hejmarê kesên bi şewba Covîd-19'ê ketî ji 84 milyonê derbas bû, xebat û ceribandînen ji bo bikaranîna aşiyê li gelek welatan berdewam dikin. Ji şîrketên wek Pfizer û BioNTechê gelek dewletên wek DYA û welatên Yekitiya Ewropayê (YE) bi van her du şîrketan re peymanên dozên aşiyê îmze kiribûn û di hefteyên borî de dest bi aşîkirinê kirin. Li gelek welatan aşî cara yekemîn ji aliyê hin siyasatmedar, serokdewlet û hwd. ve li pêşberî kamerayê hatin kirin.

## Peymanên ji bo aşiyê

Wek tê zanîn, pêketiyên şewbê herî zêde li DYA'yê ne. Di meha kanûnê de ji serokê hilbijartî yê Amerîkayê Joe Biden heta hin nûnerên Civata Senatoran derziya bi navê vaksîna Pfizer li pêş kamerayê bikar anîn. Biden berî we hilbijartinê ji soz dabû ku dê li dijî vîrûsa koronayê têkoşîneke xurt bide û pêşiya wê nexweşiyê bigire. Jixwe DYA'yê bi şîrketên Pfizer û BioNTechê re peymanên

Piştî ku şewba Covîd-19'ê li her devera cîhanê belav bû pandemî hatibû îlankirin. Pandemiyê salek li pey xwe hişt niha hemû dewletên cîhanê li pey dozên aşiyê ne

ser 100 milyon dozên aşiyê danîbû.

## Destûrdayîna bikaranîna aşiyê

YE'yê ji bo 200 milyon dozên aşiyê bi şîrketên Pfizer-BioNTechê re peyman îmze kiribû. Heftayên borî Komîsyona YE'yê ji bo bikaranîna vaksîna Pfizer/BioNTechê destûr daye Ajansa Dermanan a Ewropayê (EMA). Piştî destûrdayîna wê li welatên YE'yê dest bi belavkirina vaksîna bikin. Li gor seroka Komîsyona YE'yê Ursula Von Der Leyenê der barê mijarê de daxuyanî dabû, gotibû ku piştî biryara EMA'yê û bi destûrdayîna Komîsyona YE'yê vaksînan Pfizerê yê di tesîsên Belçîkayê de tînin çêkirin wê di nav çend rojan de li welatên Ewropayê bînin belavkirin.

## Dê heta biharê gelek kes aşî bibin

Serokwezîrê Brîtanayê Boris Johnson ji Vaksîna Pfizer a ji aliyê Zanîngeha Oxford û AstraZeneca çêkiriye, 100 milyon dozên aşiyê xwestibûn. Her

wiha Brîtanayê ji bo vaksîna Pfizer û BioNTechê berî dewletên din destûr dabû. Wezîrê Tenduristiyê yê Brîtanayê Matt Hancock diyar kir ku heta demsala biharê li Brîtanayê dê gelek kes aşî bibin û bi vî awayî di peyvajoya pandemiyê de pêşiya xwe çêtir bibînin.

## Bêyî ceribandinê dê aşî bibin!

Tirkiyeyê jî ji bo pêşgirtina li şewba koronayê bi dewleta Çînê re li ser derziya bi navê CoronaVac bi şîrketên SînoVacê re peyman îmza kiribû. Ji bo meha çileyê 20 milyon, ji bo meha sibatê jî 10 milyon û bi tevahî dê 50 milyon dozên aşiyê ji Çînê bikire.

Heftaya borî serokwezîrê tenduristiyê Fahrettin Koca ji bo bikaranîna aşiyê da zanîn ku li Tirkiyeyê dê meha sibat û adarê rojê milyonek û 100 hezar kes bînin aşîkirin, lê wê ewilî li ser aşiya Çînê lêkolîn bê kirin û ev lêkolîn 2 hefteyan bidomîne.

## Guman hene

Hewceyî gotinêye ku ji bilî Tirkiyê û Endonezyayê heta niha tu welatî jî şîrketên Çînê siparişa dozên aşiyê nekirine. Ev yek jî li Tirkiyeyê dibe sedema gelek gûmanan. Ji bo wê yekê jî li ser platformên medyaya civakî gelek kesan bi navê 'em aşiya Çînê naxwazin' bertek nîşan dan.

Li gelek welatên din jî bikaranîna aşiyê û encamên wê niha tînin nîqaşkirin. Ji ber wê jî bo aşiyê gelek kes bêbiryar in. Dewletên ku niha dest bi bikaranîna aşiya kirine û yê hê jî diceribînin, niha dê di kîjan şert û mercan de aşiyê bikin nîqaşan dikin.



## Sersala we pîroz be!

Em sala nû bi hêvî û bendewariyên nû pêşwazî dikin. Bi sala nû re em ji bo hemû gelên xwe hêviya aşî, tendrustî û rojên kêfxweşiyê dikin.



TMMOB Şaxa Odeya Endezyarên Makîneyê ya Amedê



Destar Rantxwarî malxwarî  
Ehmed Pelda û kedxwarî

Vê gavê karê herî hêsan karê bi riya hizra teorîk dijberiya kapîtalîzmê ye. Yekser em dikarin bibêjin sermayedarî pergaleke talankar e, bi darê zorê keda xebatkaran desteser dike, berhemên bi destê wan hatine çêkirin wekî talanekê jî xwe re dike mal û difiroşe. Qezenca pê dike jî li dewsa bide xwediyê karûxebatê ango karkeran ji xwe re hildide û dişuxulîne.

Bi taybetî dîtina Karl Marks li ser wan her du bingehan hatiye rûniştandin.

Ya yekem zordestiya li ser kedê ango hilberînê ye. Li gor wê, sermayedar bedela keda xebatkara heq kiriyê nadê. Ev kedxwarin e.

Ya duyem li bazarê firotina berhe-man girêdayî buhayê ye. Dîtin ew e ku, "ji ber pêdiviyê, kesên daxwaza berhemê dike, hatiye bazarê û ji bo wê jî destê rikeberên xwe derxîne û bike malê xwe, buhayê nixê berhemê zêde dike. Bi vî awayî kesê firosker dibe xwedî qezenceke din ku ji nixê hilberînê, yê berhemê zêdetir e. Ev jî malxwarin e.

Lê rewşa îroyîn jî wê rastiya kedxwarin û malxwarinê derbas kiriyê û gi-hîştîye merhaleyêke bêpîvan. Êdî di ber xebata karkeran de robot jî hene. Her wiha alavên li ber destan gelekî bi pêş ketine û xebatkara jî wek dema Marks zêde naxebitîn û nahincirin. Li dewsa xebatkaran niha êşa mezin a şênîyê betal û bêkar e. Yanê kesên ku dixwazin keda xwe erzantir pêşkêş bikin, lê beramberî wê jî nikarin karûxebatekê peyda bikin hene. Ev li bendê ne ku karekî bibînin, pê bibilênê û debara xwe bikin. Mixabin ev derfet jî her diçe kêmtir dibe.

Bi taybetî welatên ji hêla aborî ve hejarmayî, ji hêla zanistî ve paşde-mayî, ji hêla xwerêxistinê ve bê-çaremayî nikarin li hember rikeberên xwe bikevin pêşbaziyê û ji hêla çêkirin û bidestxistina berhemekê ve bi ser bikevin. Lewma hêviya xwe birîne ku xweserê xwe serederiya tiştekî bikin. Lê belê giraniya xwe dane lêgerîna serdestekî ku xwe bispêrinê û erzanî be jî derfetên karpêkirinê bi dest bixin. Ev rêûdirba ji hêla aborî ve pêk hatiye, êdî bûye fêrdariya siyasî, çandî û civakî jî. Lewma kîjan dewlet bikaribe sermayeya şîrketên mezên ên navneteweyî ango cîhanê binîn welatê xwe, xwe serkeftî dibînin. Ji bo wê bertilê didin lobiyan, hewildanên siyasî û diplomatîk saz dikin. Radigihê-jîne hebûnê welatê xwe û pêşkêş dikin ku şîrketek navneteweyî biryara sazûmaniya karekî li ser axa wan bike.

Bi wê sayê pişesazên mezin ên navneteweyî êdî yekser bi çêkirina berhe-

man re eleqedar nabin. Bêhtir giraniyê didin ser vekolînê, afrîneriyê û rêxistina pergala hilberînê. Ji bo çêkirina berhemê pişeyî karê çêkirina her parçeyekî bi welatekî re parve dikin. Lewma him erzan didin çêkirin, him jî rêûdirbên hînbûn û destxistina pergala berhema pişeyî digirin û heya bigire kilît dikin. Ji çêkirina otomobîlan bigirin, heyênî dermanan, kompîter û nivîsandina plankirina xebata wan, çêkirina çekûs-lahan gelek cure bi riya patentan, zanîna hunerî û pişeyî, plankirin û projekirinê hemû di destê wan de ne.

Ev rewş êdî wek rantxwarî tê qebûl kirin ku radeya talana wê, bi kedxwarin û malxwarinê re nayê rûberkirin. Gel wan dewletên petrolfiroş, çekfiroş jî di nav de her yekî serê kaniyekê girtiyê û nahêlin kes û hêzek jê feydeyê bibîne.

Hizra rantxwarinê bi Davîd Rîcardo yê Îngîlîzê tê nasîn ku di destpêka pişesaziyê de ev rewş dîtîye û lewma rexneyê li wê pergaleke dike. Piştî ramansazê sermayedariya serbest (liberal kapîtalîzm) Adam Smith kesê duyemîn ê mohra xwe li wê pêvajoyê xistiye Rocardo ye. Gelek çepgir, anarşîst, keynesyen û daxwazên pergalsaziya rêxistinîkirî (ordnung economy) û neo-rîcardiyen jî bo rûniştandina bingeha dîtina xwe Rîcardo wek referans dibînin.

Serqise, li gor angaştê xwediyê wê dîtîne heke rantxwarî bê sekinandin an jî hevsarê wî bê zefîkirin, pêkan e ku pergala aborî ya hilberîner wê baştir bimeşe û têkiliya karker û sermayedarên jî wê li gor dengeyêke dadwerane bê rûniştandin. Ku sermayedar hewceyî karkeran e û lewma wê destekariyê bide daxwaziyên karkeran ku hevdu bihewînin û xwe di pi-yaseya rikeber de ragirin. Karker jî mecbûr in sermayedar biparazên ku rê nedin ew ji nav biçê û xwe ji karûxebatê feremûş neke.

Heke em bi civata xwe re rûbirû bimînin, em ê gelek mînakên rantxwar ên navmalî bibînin. Wekî gotina berê heke şêx û beg û axa destê xwe ji ser piştê gundiyan vekişînin, heke serwer û serbaz û karmendên payebilind îltîmasê nekin, heke hosta û mamosta û ruspî li dewsa xwedan huner û pişeyan nas û xasên xwe nedin pêşiyê, bawer bin karker û kedkar jî, xebatkara û şixulkar jî, zana û pişekar jî, hunermend û karmend jî, sermayedar û maldar jî wê hinekî bi ser xwe ve bînin. Belê rasterast pergala kedxwarin û malxwarinê yekser ji holê ranabe, lêbelê çêtir e ku li dewsa riya purçkirinê riya kar û xebatê bê vekirin.









Kenan Colemêrgî

## Şevzengilk

Demek ji demên benîademan, xwe-diya sê zarok, mêr û malekê, bo lêk-dana teraş û êzingan diçe bin lateka çiyê, bo karê zivistanê têra xwe so-temeniyê lêk dide. Dengê ecêbê tê, çî bibihe! Dengê ji lata çiyê tê!

Cara ewil ev deng weke bage-rekê, sîrênê ji xwe tîne, paşê bi wê jinê re dest bi axaftinê dike.

Lata çiyê;

Hêê jinê! Bayên kur li serê min didin, bayê şine jî li çepê min dide, here ji gundiyan xwe re bibêje, yek ji we namîne, hûn dê qir bibin!

Jin matmayî dimîne û xofa xwe ji ser xwe diavêje û dibêje;

Çiya! Her tu yî me dihawînî, dê me bihawînî jî... Tu pêşiya me jî hebûyî, dê piştî me jî hebû. Te dît yên pêşiya me jî çî kirin, tu dê bibînî em û yên piştî me jî dê çî bikin. Ka bêje yên pêşiya me çî kirin ku em jî bikaribin xwe ji vî qirbûnê xilas bikin?

Lata çiyê;

Min jî heta niha qet tiştek wiha nedît, ez bawer nakim çiyayên dût jî dîtîbin. Ez heme û hûn hene heta niha kesek tiştek wiha nedîtîye!

Jin;

Heke gundiyan min çare ji min pirsîn û zarokên min, mêrê min ê kop... Ez dê çî bikim çiya, derman ha derman!

Lata çiyê;

Derd jî her hûn in, derman jî her hûn!

Jin piştî van gotinan bi tirs xwe li mala xwe dide. Tiştên çiyayî jê re gotî ji hemû malbata xwe re dibêje; bayê şine û bayê kur li hev dikevin, dê her berf bibare, heke em bi berfê nekarin, em ê qir bibin û bimirin.

Jin difikire û her difikire, dawiyê tiştek tê bîra wê, zengilka pezên xwe li serê çixleka darî vedike û diçe ser banî rast dike û diçikilîne.

Tê malê dibêje mêrê xwe, "her çend pezên me hebin hemûyan serjê bike."

Dibêje bûkên xwe, "her çend êzing û teraş hebin binê kuçik hilkin

û her goştê serjêkirî bipêjin." Dibêje kur û keçên xwe, "her çend dengê zengilê bîriya, bi ser banî bikevin, berfê biavêjin."

Pê re baz dide diçe malên hemû gundiyan xwe, dibêje, "hal û hewal wiha ye, heke hûn tiştên bi gotinên min bikin hûn dê serfiraz bin lê belê heke hûn bi ya min nekin, hûn dê bi bin bikevin."

Kes bi ya jinê nake. Hinek dibêjin, "ma qey em dîn bûne hemû pezên xwe serjê bikin, hinek dibêjin, "qey me keda xwe li erdê ditiye kar û barê xwe yê zivistanê bo şevêkê pûç bikin" welhasil û kelam, kes bi ya jinê nake.

Dibe şev, bayên kur li serê xanî didin, bayê şine li çepê malê dide, berf dest bi barîna xwe dike. Jin her çawa gotibe yên malê bi ya wê dikin. Her çend li banî dengê zengilê nehê û dibire, dizanin ku berf heya zengilê bariye, diçin berfê diavêjin, diwestin û tîn xwarina xwe dikin û xwe germ dikin. Wê şevê heya sipêdê bêrawestan vê dubare dikin.

Dema sipêdê barîna berfê di-qede, yên malê hemû diçin ser banî. Çî bibînin! Tiştek nemaye, her der di bin berfê de maye hemû kes di bin berfê de mane, qir bûne...

Ev çîroka şevzengilkê ye, bo ku yên li çiyayên Colemêrgê dijîn, biza-nibin şeva şevzengilkê demê çawa ye, fêr û nişaneyek e. Weke gelek serhatî û metelokan dixwaze tiştên ji xeletî û sistiya mirovan peyda bûne, bide pêşiya wan û weke gelek xeletiyên rojane bi ziman û zanîna mezin û ditiyan me ku bîne pêşiya me. Mirov li ser dinyayê bi qasî ku hene, şer digel xwezayê dikin lê belê bi alîkariya xwezayê şer dikin.

Çawa bi alîkariya xwezayê? Weke di vî serpehatiyê de, mirov (jin) ewilî pirsyara xwe li xwezayê (çiya) dike. Xweza jî mirovan hişyar dike. Bi çixleka darê û zengilkê ji-yana malbata xwe xilas dike. Tiştek



giring jî heye ku ew jî digel xwezayê şer dike bi hişmendî û hêza xwe...

Rastiyeke mirovahiyê heye. Ew rastî, rastiya kiryarên mirovan e. Mirov her çî bike wê tîne serê xwe, her çî kiribe jî hêza xwezayê sîd wergirtiye û her çî kiryarên şaş bike, dawîya dawî bi ya xwezayê dike, ve-digere hêz û dilovaniya xwezayê.

Li van rojan dinya nêzikî şeva zengilkê ye, ji hemû deveran tiştek gelek hêsan tê gotin, parastina xwe bikin, heke hûn nekin keseke din parastina we nake. Weke ku jin ji çiyê dipirse, "te yên pêşiya me jî dîtî, yên piştî me jî dê bibînî, ka bêje çî ye derman, yên pêşiya me çî kirin?"

Çiya dibêje, "heta niha min jî tiştek wiha nedîtîye, herin û xwe ji vî şevê biparêzin."

Metaforek gelek mezin di nav vî axaftinê de heye ku li ser bûyereke wiha mirov dikare çend parastinên

mirovahiyê jê bipirse. Xweza te (wek mirov) hay ji xwe tîne û hem jî hêza te dipêve digel te şer dike.

Weke bersiva çiyê dayî, qet tiştek wiha heta niha nebuwe, here û parastina xwe bike.

Mirov, çû gihîşt malbata xwe û ya xwe bi malbata xwe da kirin, wan xwe xilas kir. Lê belê gundî bûne qurbaniyan tamahî û guhşoriyan xwe.

Hêviya me ew e ku êdî dengê wê zengilkê nebire, her û her dengê wê zengilkê bê.

\*Şevzengilk, şeva zengilkê: Çile (kanûna paşîn-rêbendan) ye, şeva berê heyhotê ye. Ev bûyerê êdî li ser axên Colemêrgê dibe nişaneyek, şeva zengilkê, şevzengilk...

\*Bayên kur: Bayê ji bakurî tê.

\*Bayên şin: Bayê ji rojhilatî tê.



Amed Tigrîs

## Geşedana dengê zarokan

Zarok bi giştî di yek saliya xwe de dest bi axaftinê dikin. Pêşî bi gix-biv dest pê dikin. Di meha pîncan de dev bi ken dibin û îşaret bala wan dikîşîne. Di şemehiya xwe de êdî dengê yek kîte derdixin. Wek ma, ba, de, biv... Zarokên normal di yek saliya xwe de dikevin pêvajoya axaftina dengkîteyên dirêj. Di sê saliya xwe de hevoke saz dikin, lê hîn jî nikarin hinek dangan baş derînin. Di vî temenî de gelek asayî ye ku pirsgirêkên deng hebin. Ji ber ku organên wan ên axaftinê baş nestewîne. Wek masûlk, çene, ziman, diran, ziving... Ji ber nestewîna van organên axaftinê zarokên biçûk nikarin hinek dangan derbixin. Bi taybetî dengên ku bi liva ziman û ji gewriyê bi şidî dertên, baş nikarin bi lêv bikin. Zarok nikarin û nizanin çawa ziman bitewînin û bilivînin, bi pêş û paş ve bibin û bînin û hema ew rasterast dipeyivin.

Bi taybetî nikarin dengên "r", "k", "ç", "g", "y", "z..." derînin an bi lêv bikin. Li gorî geşedana organên laşê her zarokî dikare cureyên bilêvkirina dangan werin guhertin.

Ji derî vî rewşa normal hinek sedemên din jî hene ku zarok nikarin bipeyivin. Wek otîzm, hişdarî û pirsgirêkên bihistinê. Zaroka wiha divê bibin ser diktorê taybet. Ev cure arîşe ne mijara vî nivîsê ye.

Ez behsa zaroka normal dikim, a ku nikare hinek dangan rast bi lêv bike. Baş e dêûbav û mamoste ji bo van zarokên normal ku dangan şaş derdixin, dikarin çî bikin?

Berî her tiştî divê nekevin tatêlê, angû panîk nekin û zarokê di halê wê yê asan de bihêlin. Bi israr li ser dengê şaş rane-westin û her tim ew deng pê nedin rastkirin. Bi tenê zarok dema dengê şaş derdixê, dêûbav an mamoste divê bi dengê rast bersiva zarok bide û nebêje, "tu şaş dibêjî, rastî ev e." Heke tim ji zarok re bêjin, "tu şaş deng derdixî," wê demê dikare li ser zarokê bandoreke neyînî bihêle û derûniya zarok xerab bike. Şaşiyeke din jî ev e ku carnan dê û bav qaşo ji zaroka xwe bêtir hez dikin, ew jî bi wî dengê xerabe bi zaroka xwe re dipeyivin. Ev şêwe jî nebaş e û divê dêûbav wiha nepeyivin. Dema ew weha bipeyivin zarok jî êdî naxwaze dengê orjînal derbixê û proses dirêj dibe.

Li mal, li zarokxane û li dibistanê divê bi zimanê zarok henek neyî kirin. Pêwîst e mamoste pêş li şagirdên din bigire ku henekên xwe bi zarok nekin. Mamoste pêş lê negire pirsgirêk mezin dibe û dibe mobîng. Min di salên 1970'yî de li herêma Licê dest bi mamostetiyê kir. Du şagirdên min hebûn ku ew nikaribûn yek-du deng rast derbixin. Şagirdên din teqlîda wan dikir û ji wan re digotin "lalo". Ez li şagirdên xwe gelek sî bûm û min vî navnûçikî li wan qedexê kir. Divê kes bi wan henekê xwe neke. Piştî salên 1985'an yanî 15 sal bi şûn de dema min li Stockholmê dest bi mamostetiyê kir, min dît ku ev pirsgirêk li wir çiqas girîng tê dîtî. Civat û mamoste şagirdên xwe wiha perwerde kirine ku kes bi wan zarokan henek nake, gelek normal dibînin û heta şagirdên din ji wan re dibin alîkar. Li welatê pêşketî li her dibistanê mamoste û pisporên taybet hene û di nav livdanekê de ne ku pirsgirêkan çareser bikin. Hezar mixabin li welatên paşvemaî îro jî metodên premîtvî bi kar tînin, encamên xerab û neyînî li ser zarokan dihêlin. Wek mînak pênûs an kevçî dikin devê zarok û bi saetan heman dengî pê didin dubarekirin, zaroka biçûk telaqreşo dikin.

# Sersala we pîroz be!

Em hêvî dikin ku sala nû ji bo gelên me bibe wesîleya aşî, tenduristî û kêfxweşiyê.



TMMOB Şaxa Odeya Endezyarên Madenê ya Amedê



Firçeya Şikite

Gulçin Adar

# Keştîya multecîyan de bêwar a

Verê ke ez şima rê qalê rayîrwanîya keştî bikera, wazena şima bibê mêmânê hikayeya mi. Ez kêneyêka 15 serrî ya. Nameyê mi bêwar a. Ma welatêk Rojhelato Mîyanên de pêwa dadî, babî û di wayê min ê qijî ma keyeyêk hewşeyîn de ciwîyayîne. Babîyê mi karê necarî kerdêne û dadîyê mi zî terzîxaneyê ci bi. Ez şîne wendegeh. Hevalê mi zaf bî û ma yewbînan ra zaf heskerdêne. He-

valê mi ge-ge ameyîne hewşeyê ma û ma pê dir tewir tewir kayî kay kerdêne. Cuya ma bi weşî derbaz bîne. Ma nêzanayîne ke gonîwerê ke rî û ruhê înan tarîyê do ma cuya ma ra, welatê ma ra bikerê. Ez qet nêwazenê a roja xirab bî-yarî xo vîr. Ez vana qey şina o wext û reyna reyna ciwîyena. Vengê topan, vengê guleyan, vengê qîrîn û hewara tutan û dayîkan!..Ma pey xo de zaf çî

verda la ê vengî her wext mi dir bî, ruhê mi de û hewnanê mi de bî. Êdî o ware ma rê kerdib sey cehenem. Ma mecbûr bî ke cayê xo terk bikerê û şêrê cayêk asayîş. Mi rê zaf zehmet ame; terkkerdişê kuçe û keyeyê xo, welatê xo û vîrardişanê xo.

Êdî xêrcê şîyaşî destê ma de çîyêk nêmendib. Pêwa çend cîranê ma, ma kewtî rayîr û ma nêzana ke rayîrwanîya

ma bêpeynî ya... Ma nêzanayîne gelo ma şêrê ça û bieşkê ça de star bibê. Her ca xerîb bi, her ca xidar bi û her ca de sînor bi. Xora ez qet mana nêdana sînoran! Goreyê çî û goreyê kamî sî-norî? Nê pîlan çiqas dinya kerda teng! Çiqas weşîkiyan rê biyê asteng! Şima qet diyo asmên de teyr û tûran rê sînor ameyo ronayîş? Yan zî asmên de xê-zêke ameya xêzkerdiş û sînor diyayo vernîya teyr û tûrî? Elbet şima nêdiyo û mi zî nêdiyo. Senî teyr û tûrî asmên de azad ê, her ca û her ware rê aîd ê, însanî zî rîyê erdî de wina yê. Şêrê ça êdî uca beno wareyê înan. La çî heyf, tu kes xerîbê ke welatê înan de ca benê, wina nêzdî înan nêbenê. Înan rê muameleyê zêdeyî kenê. Mi nê zaf dî. Ma her sînorêk derbaz kerdêne, hemwelatîjê ê welatî yan bi çimêke guna ewnî-yayîne ma ra, yan zî bi çimê ke nefret!

Gelo semedê çî nefret? Semedo ke nijadê ma yewbînan ra çîya yo? Yan zîwanê ma, yan zî rengê ma? Gelo mumkin o ke rîyê erdî de tena yew nijad bimano? Tena yew zîwan bimano, yan zî yew reng! Bifikrîyê rîyê erdî de tena tewirêk esto o wext weşîkiya dinya, dewlemendîya dinya manena gelo? Dinya bi rengê tewir tewiran hîna bena weş û bena dewlemend. Çî heyf ke nijadperestî xêrcê netewê xo dişminîyê pêro rengan ê. Xirab û gonîwer ê! Multecîyan rê neyar ê û qeşmerî bî înan kenê. Ez û keyeyê xo ma zaf vatîşanê înan yê qijvîstîşî, heqaretan reyde rî bi

rî mendî. Gama ke ma esparê wesayît bîne, nêwaştêne ca bidê ma. Yan zî ma ronîşte bîne xo dûrî ma dayîne û muameleyê lêşînî ma dir kerdêne. Pîyê mi seba ke ma rê keyeyêk bivîno, şew û roj kuçeyan de geyrayîne. Wayîrê keyeyan nêwaştêne keyeyê xo bidê ma, yan zî fiyatêk vay vatêne. Xora kar vînayîşê pîyê mi zaf zehmet bi. Wayîrê kargehan waştêne bi karo giran, pereyêk erjan xebate bikero. Pîyê mi vernê de her çiqas qeubul nêkerd, la dima ra seba debara ma mecbûr mend. Dadîyê mi rewşa ma ra zahf qehr bîne. Ne hevalê dadîyê mi û ne zî hevalê ma bî. Zîwanê ma yewbînan ra çîya bi; labelê ma zî sey înan bîne vêşan, hes kerdêne, fikirîyayîne, xeyalê ma zî bî û ma zî sey înan, însan bî.

Ma ê çî pêro peynî de verdayî û her çiqas sebebê çîya ma na keştî de kom kerdib zî labelê dej, endîşe û hesretê ma yew bi. Gama ke ma nêkewtibî nê rayîrî; ma welat, ware û keyeyê xo de biwayîr bî. La nika na keştî de ma pêro bêwar û bêca bî û ma bi hîsêk tîmîyan de rayîrwanîya ciwîyayîşêk nêdiyar kerdêne û nika na keştî de waştîşê ma hemine oyo ke ma bi saxî biresê cayê xo. Şima zî zanê ke xeylêk multecî derya de xeneqênê û nêresenê cayê xo. Eke ma nêxeneqîyê dadî û babîyê mi vatib, welato ke ma şêrê uca de însanî multecîyan ra hes kenê. Zerrîya mi ra nika pelpelikî perenê û ver bi welatê mi de bi hêvî û bi heskerdiş şinê.



## 2020an de çiqas kitab ameyî çapkerdiş?

Merkezê Xeberan

Keyepelê Diyarnameyî emserr zî listeya kitabanê kurmanckî û kirmanckî ê ke serra 2020î de ameyî weşanayîş hadre kerd. Goreyê listeya emserrê şîir, roman, hikaye, kitabê domanan, ferheng, zîwan, tarîx, cigêrayîş, folklor û babetê çîya çîyayî zî mîyan de 268 kitabî ameyî çapkerdiş.

Goreyê xebera Cemil Oğuzî; emserr pandemî tesîrê xo bi her raştewî kerd, ameyîne meraqkerdiş ke emserr yan zî par zêde kitab çap bîyî? İstatistikê Diyarnameyî ra asîyeno ke serra 2020an de hîna zêde kitab ameyî çapkerdiş. 2019an de 252 kitab çap bîyî. Serra 2020an de qaseyê ke keyepel xo resna İstatistikînan, 268 kitab ameyî çapkerdiş. Keyepel da zanayene ke helbet liste de kêmanî estê la ê heta ke înan ra ameyo liste hewl dayî baş hadre bikerî.

### Emserr zî şîir aver de yo

Sey her serrî emserr zî tewr zêde şîir ameyo çapkerdiş. 2019an de 67 kitabê şîirî ameyî çapkerdiş û 2020an de zî 73 kitabî çap bîyî. Şîir ra dima tewr zêde roman ameyo çapkerdiş. Hûmara roman zî 49 a. Rêza 3. de hikaye esta û 36 kitabê hikayeyî çap bîyî.

Lîsteya emserrî de 25 weşanxaneyî estî. Mîyanê înan ra weşanxaneyo ke tewr zêde kitaban çap kerdo Weşanxaneyê J&J yo. J&J bi 41 kitaban rêza yewine de yo. Wexanxaneyê Lîsî 35 kitab çap kerdo û rêza 2. de yo. Weşanxaneyê Avesta zî 30 kitaban çap kerdo û rêza 3. de yo.

Weşanxaneyê Morî ke kitabê domanan weşêneno emserr zî no kultur domna. Weşanxaneyê Wardozî ke kitabanê folklorî çap keno, emserr vîşêrê tena kitabêk, kitabanê folklorî çap kerdo.

### Kitabê kirmanckî

Weşanxaneyê Roşna û Vate; di weşanxaneyê ke bi kirmanckî (zazakî) weşan kenê zî liste de ca girewtî. Vîşêrê nê weşanxaneyan sewbîna weşanxaneyî tena heb heb kitabanê kirmanckî çap kenî. Kitabê kirmanckî goreyê serra verên hina tay ameyî çapkerdiş. Vate 9 kitaban û Roşna zî 2 kitaban çap kerdî. Sewbîna Peywendî zî tena 2 heb kitaban çap kerdo.

### Nuştoxto ke zêde kitab veto

Nuştoxto ke tewr zêde kitab çap kerdo berardoxkar Hilmî Akyol o. Aykol 30-40 serrîyo ke karê berardoxkarî keno û xebatanê xo her serre parçe bi parçe dano weşênayîş. Emserr 11 kitabê berardoxkarî liste de estî.

Lîsteya kitaban no link de ya. Ê ke biwazê liste bivîne eşkenê biewnî link .



## Munaqeqşeya betalîya Çewlîgî

Merkezê Xeberan

Parlementerê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Çewlîgî Erdal Aydemîrî çendêk verê cû Meclîs de qisey kerd û vat ke Çewlîg de bêkarî, xizanîye asta tewr berze de yê û hukmat rexne kerd. Aydemîrî qiseykerdişê xo yê Meclîsî de vist vîrî ke AKP 4 dewran ra nata Çewlîg îdare keno la rewşa şaristanî vera bena xirabêr. Aydemîrî Meclîs de fotografêk ke tede cinîyêke çopî ra werd vejena û wena mojna.

Qiseykerdişê Aydemîrî ra dima Walîtîya Çewlîgî vatişê Aydemîrî red kerd û Aydemîrî zî bi eşkerayîyêke cewabê walîtîye da.

Aydemîrî Meclîs de wina vat: "Bado ke mi meclîs de qisey kerd Walîtîya Çewlîgî ke wezîfeyê serekîya AKPyî yê Çewlîgî zî fiilî kena vato do neyê derheqê bêkarîyê û feqîrîye raşt nîyê. Ez sere de vajî meseleyê Çewlîgî ke ma ardî zîwan ganî cewabê înan Cevdet Yılmaz û Fevzî Berdîbek

bidê ke çewlîgîyan ê vîjnayî."

Goreyê İstatîskanê sîgortakerdeyan ê Tirkîya (tebaxe 2020) 8 mîlyon 37 hezar kesî feqîrîye ra neêşkenê sîgortayê xo bidê. Muracatê dayîşê bêkarîye yeno vatene ke humare 3266 a. No ramojneno ke şarê Çewlîgî bêqeyd xebityeno.

Heto bîni ra Ardemîrî qiseykerdişê xo yê Meclîsî de bale antbî rewşa Mehmet Kiliço ke Unîversîte bi derece qedênayo û Çewlîg de çayxaneyêk de nika bi garsonî debara xo keno ser. Aydemîrî da zanayene ke çayxaneyo ke Kiliçî tede xebetiyeno pandemî vera padîyayo û Kiliç nika betal o û nêşkeno nan bibo keyeyê xo.

Mehmet Kiliço ke di unîversîteyan bi derece qedênayo diyar kerd ke hirê dîplomayê ci keye de estî û cinîya ci zî unîversîte qedênaya la nika ê wîrdî zî betal ê. Kiliçî da zanayene ke merdimê ke o şinaseno wendîş û nuştîşê înan çin o girîyayî kar la no welat de qiymet nêdiyeno merdimê wendoxan.



*Nico*

Xanimê qey vê mehê te ceyran zêde xerç kiriye?

Na

Naxwe te gaz zêde şewitandiye?

Na wele

Qey te zêde dan û standin kiriye.

Na heyra na çima dipirsî?

Xanimê xuya ye, te çav berdaye wî 500 TL'ê zêde kirine!

Bibore min got 500 tl û 90 qurîşê li serê ji bîr kir...

90 qurîşê zêde serê te û wan bixwe. Jixwe her tişt ji sedî not û neh zêde bûye ez çî bikin ji te re!..



Kewê Redkan

### Celîlê dikançî

Wexta meriv bi tena serê xwe bijî zehmet e. Eva çend sal in ez bi tena serê xwe dijîm. Di mala xwe de bi tena serê xwe dijîm, wekî din ez ne tenê me. Cînarên min wek malbata min her tim li cem min in. Ez xwe qet tenê nahesibînim. Tenê car caran dema pêlazimiya min çêdibe ez diçim dikana Celîl, şekir, çayê û hin tiştên din distînim, ew jî mehê carekê yan diçim û yan jî cînarên min ji min re distînin.

Lê heçî gava ez diçim dikana Celîl, ew destê xwe li hev dide, çavên wî ji berê zêdetir fireh dibin, li der û dora min diçe û tê, dibêje; ev demek dirêj e tu xuya nakî, nayê dikana min jî, ez bi serê bavê te û serê bavê xwe kim jî pir ketim heyra te. Min xwest ez hinek şekir û mekir, çayê mayê ji bo ku te bi bînim werim mala te lê min ev wêrana dikanê tenê nehişt û ne hatim.

Tu baş î? Kesek te aciz nake ne wisa? Ger kesek te aciz bike ji min re bêje, ez ê te biparênim. Piştî demekê min gotinê wî nebihîstin, ez ker û gēj bûm, hema li dora min diçe û tê. Min got; na heyran, kesek min aciz nake, çima min aciz bikin? Hemû jî der û cînarên min in.

Ka du kilo şekir û çayekê bide min û buhayê wan çî ye bêje, li min dereng e ez ê herim. Min got û wî got, mesele dirêj kir, ez dixwazim şevê bibim mêvanê te, dixwazim alîkariya te bikim, dixwazim û dixwazim. Min dî ez xwe jê xelas nakim, de baş e, sibe êvarê ware mala min.

Wî bi şabûna ji dikanê derket û careke din hat. Neyselê mesele pir dirêj e û dirêj jî bû. Ez bi rê de fikirîm, gelo çawa xwe ji vî malmîratî xelas bikim? Min mesela xwe û Celîl ji cînarên re got. Sibetira din êvarê, derî lêket, min derî vekir, waye Celîlê me, her du destên wî tijî ne, bi kelecana kete hundirê malê, xwest ku bêje 'wa ye ez tu li malê tenê ne', dît ku hemû cînar bi malbatên xwe ve li mala min rûniştî ne. Hemûyan bi hev re got, Celîl keremke were aliyê jorîn rûnê.

Celîl li min û cînarên nihêrî, rengê hat û yek çû li ser rûyê wî, got; min got qey tu tenê yî, te bigota cînar û hemû gundi-yên me hatine, ez ê rojêke din bihatama serdana te.

Peeee, cînarên got; na heyran her roj em di nav hev de ne, deriyê me vekirî ne, dema te xwest tu jî were.

Celîl got; erê, heke dema min çêbû ez ê werim serdana we û qet xatir ji me nexwest û çû. Careke din me Celîl nedît, wê şevê dikana xwe digire û diçe, em hê jî nizanin Celîlê dikançî bi ku de çû, lê em dizanin ji şerman re nikarîbû êdî di nav gund de dikançîyê bike.

## Tiştanok (mamik)




- 1- Mamê Mino mamani Gayî zexel li pişt malê mexel Kî dizane ew çî ye?
- 2- Tiştêk min heye Giloka mû, li serê diyanar belav bû Hûn dizanin çî ye?
- 3- Tiştêk min heye Giloka reş avêt piştta heft çîya Ew çî ye gelo?

Çavkanî: *Hilmî Akyol*

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazî ji kerema xwe hûn jî tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**  
1-Kundir 2-Mî! 3-Şev

## XAÇEPIRS



### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Madeneke buha û hêja, xemil û xêza bûk û zeriya 3. Balindeyeke dengxweş, kurd pê nêçîrê jî dikin 5. Binê lîngan 6. Ne pêkan e, çênabe 7. Ji qehfikan dihate çêkirin û berê ava malê tê de dihiştin ji bo ku bicemide 9. Bajarekî rojavayê Kurdistanê, sembola berxwedanê 12. Kesên ji Wanê 14. Kurteya Yekitiya Ewropayê 15. Xelkên Mîtanê 17. Sewaleke kedî, bi keriyên tîn xwedîkirin. 18. Bersiva neyênî 22. Bêmalî, şerpezebûn

### JI JOR BER BI JÊR

1. Evîndara Mem
2. Alaveke muzîkê ya kevnar
3. Cînavka pirsyariyê
4. Cînavkeke di rewşa tewandî de
5. Extiyarî
7. Xweşikbûn
8. Madeyeke sereke di çêkirina xwarinan de
10. Beşeke ji malê
11. Paşnavê navdarekî kurd, Ehmedê .....?
13. Bawerî
14. Xelkê Yemenê
16. Reşayî, bêronahîbûn
19. Irqekî kevnar ku kurd û faris jî jê hatine 20. Pevçûn
21. Rojêke hefteyê
23. Kêfxweş, bi kêf

Bersiva hefteya borî





# Kurdistanê bêxwedî dihesibînin!

Eylem Şoreş

Meha îlonê rêzefilmê hatîye weşandin. Navê wî rêzefilmê 'No man's land' an jî bi navê xwe yê din 'şerê ji bo nivê heyvê' ye. Mirov dikare bi nav dest pê bike, beriya ku şîroveyek li ser naverokê bike. Rêzefilm der barê şerê li dijî DAIS'ê yê li rojavayê Kurdistanê ye. Vê demê destpêkê pirsê çima 'No man's land' tê bîra mirovan. Gelo dixwazin peyama çî bidin bi vî navî. Xwediyên Kurdistanê diyar in, xelkên Kurdistanê diyar in, lê wisa xuya ye derhênerên rêzefilmê ne bi vî nêrînê ne. Rêzefilm bi çar zimanan hat weşandin, tê de fransî, inglîzî, kurdî û erebî tê axaftin.

Her yek ji wan li derdora 40 deqeyî ye. Ev rêzefilm jî aliyê platformên dijîtal ên hevpar Hulu û Arte France hatîye amadekirin. Derhêneriya rêzefilmê Falce Flag dike. Di sezona yekemîn ku hat weşandin 8 beş hene. Di nav wan beşan de gelek peyama tînan dayî. Di destpêka rêzefilmê de bi nivîskî şîroveyek derbas bûbû ku tê de şerê azadiyê bi gotina, li Rojava her du aliyên ango aliyên dijber û çete bi dildarên xwe şerê hev dikin. Bi vî şîroveyê jixwe şerê şoreşê ango şoreşa jinê pir vala tê hiştin. Divê aliyê vî şoreşê yê îdeolojîk neyê jibîrkirin.

Peyamên tînan dayî divê bi baldarî were nixandî. Ne ku nayên temaşekirin berovajî divê werin temaşekirin lê çavê rexneyî divê ji bîr neçe. Karekterê sereke yê rêzefilmê yekî fransî bi navê Antoine ye. Li gorî Antoine dizane, xwişka wî ya arkeolog li Misirê jî aliyê çeteyan ve hatîye qetilkirin, lê rojekê di nûçeyan de jinekê dibîne ku dişibîne xwişka xwe. Ev jin jî li rojavayê Kurdistanê di nav refên YPJ'ê de cih digire. Xwişka Antoine, şervana YPJ'ê di

'No man's land' vî pirsê tîne bîra mirov: Gelo dixwazin peyama çî bidin bi vî navî? Xwediyên Kurdistanê diyar in, xelkên Kurdistanê diyar in, lê wisa xuya ye derhênerên rêzefilmê ne bi vî nêrînê ne

destpêkê de dem bi dem tê nîşandan. Wê navê Şahmaran li xwe kiriyê.

Lê tevlihbûna wê ya nav refên YPJ'ê girêdayî karên sîxuriyê ye. Em ê pişt re bi berfirehî behsa vî mijarê bikin. Karekterê sereke yê filmê li pey xwişka xwe berê xwe dide Rojava. Antoine ê bi sekna xwe ya bitirs balê dikişîne, li wir dikeve nav jiyaneke ji derveyî jiyana ku nas dike. Çiroka rêzefilmê li gorî sala 2014'an hat nivîsandî, lê çiqasî heqê vî demê dide mijara pirsê ye. Carinan karakter vedigerin dema paş jî. Li aliyekî din ê rêzefilmê jî bi awayekî hemwext çîroka 3 çeteyên DAIS'ê tê vegotin. 2 ji wan bi eslê xwe ereb in yek jê inglîzî e. Ev aliyê rêzefilmê dem bi dem hîsa şibandina şervanên YPJ û YPG'ê bi çeteyan dide temaşevan.

Di destpêka çîrokê de Antoine bi awayekî hesanî jî Tirkiyeyê derbasî Suriyeyê dibe, li wir çeteyên DAIS'ê rîya wan digirin. Dema alîkarê Antoine ango mêrê ku mirovan di sînoran re derbas dike bi çeteyan re nîqaş dike çalakiyek şervanên YPJ'ê pêk tê û ji derveyî Antoine her kes tê kuştin. Şervan bi fikra ku Antoine jî yek ji endamên DAIS'ê ye wî bi xwe re dibin. Di senariyoyê de li wir nêzikatiyêke pir qebe ya şervanên YPJ'ê tê nîşandan. Bi qîra wan û bi lédana wan terzê cuda tê nîşandan. Nêrîna bi çavên rojavayî li Rohîlata Navîn û bi taybetî li qada şoreşê pir derdikeve pêş.

Dem bi dem bi muzîk û dîmenên hatîne bikaranîn hinek alîgir didin. Kîjan alî... ber bi dawiya sezona yekemîn a rêzefilmê zêde derdikeve pêş. Alên çeteyan ên reş

gelek tînan nîşandan. Alên Yekîneyên Parastîne tevî jî ser kincên şervanan hatin rakirin lê weke din bi giştî xuya nabin. Bi muzîka tê bikaranîn jî bandorekê tê çêkirin. Mijareke din a girîng a di vî rêzefilmê de netîye dîtin, parastîna axê û gel a yekîneyên parastîne ya li dijî êrîşan e. Her çiqas dem bi dem hovîtiya çeteyan tê nîşandan jî li aliyê din hîskirin û watedayîna ji bo tevlihbûna nav çeteyan tê xuyakirin.

Li gorî nêrîna min pir zêde empatî ye ger mirov hovîtiya çeteyan û sedema êrîşên wan bîne ber çavan. Zimanê ku di nav aliyên yekîneyên parastîne di rêzefilmê de tê bikaranîn jî baş li hev nehatiye. Li cihek dema şervaneke YPJ'ê birîndar dibe şervanek mêr bi 'delala min' xîtabê wê dike. Li gorî pîvanên ku bi gelemperî tînan zanî ev yek jî bal kişand. Li wê derê em dikarin qala tînkiliya jin û mêran bi giştî di vî rêzefilmê de jî bikin. Piştî beşa 5'an şûnde di nav du aktorên sereke yê film ango di navbera şervana YPJ'ê û Antoine de tînkiliyek zayendî tê nîşandan. Çiqas di cih de ye yan jî çiqas pêdivî bi vî detayê hebû faktoreke girîng a perspektîfê ye. Weke ku di nav filmê şoreş û şer de, divê evîna jin û mêr hebe. Naveroka evîna felsefîk û kûr a ji bo şoreşê, ji bo azadiya jin û civakê, qet nayê hesabandin. Mirov dikare bêje tê pûçkirin. Belkî hin kes bêjin ma çî dibe qey, lê bi ya min divê nêrîn ewqas seranser nebe.

Di vî rêzefilmê de bi giştî nêrîna ku kesên tev li yekîneyên parastîne bûne ji derveyî vîna xwe ji ber neçareseriyê ke-

tine nav meseleyê. Di berdewama rêzefilmê de derdikeve holê ku xwişka ku mirî dihat zanî, piştî ku sîxuriyê ji bo îstixbarata Mossadê kir neçar ma mirina xwe nîşan bide û piştî vî berê xwe da Rojava. Li aliyê din jî di çîroka sê çeteyan de jî yek ji wan jî weke sîxur hatîye bicihkirin. Li vir dîsa ev şibandina YPG û YPJ'ê û çeteyên DAIS'ê derdikeve pêş.

Gelek aliyên 'No man's land' ên ji bo rexnekirinê hene lê tiştên di serî de tînan bîra mirovan ev in. Şoreşa Rojava tevî muxdaxeya dewletan çêbûye, ne ji ber muxdaxeya wan. Yê piştevaniya çeteyên DAIS'ê dikin jî diyar in. Ango bi giştî em dikarin bêjin gelek aliyê vî rêzefilmê yê rasteqîn hene lê ev tîgeha bi giştî tê avakirin ne yek ji wan e. Hat gotin produksiyon niha li ser sezona 2'yemîn dixebite. Kî dizane, dibe ku mijarên din jî hatibin rexnekirin û di sezona bê de, guhertinên balkêş çêbibin, lê çî dibe bila bibe çavêkî rexnegirî her tim baş e.



## Hejmara nû ya 'E-Kovara Sînemaya Serbixwe' derket

Hejmara 4'emîn a e-kovara bi kurdî ya "Sînemaya Serbixwe" derket pêşberî xwînerên xwe. Di hejmara nû ya kovarê de nivîs û gotarên balkêş cih digirin. Hêjayî gotinê ye ku E-kovara "Sînemaya Serbixwe" salê du caran bi nivîs, gotar, hevpeyvînan li ser sînema û çand-hunerê tê weşandin.

Di hejmara nû ya kovarê de Omer Bextiyar nivîsek li ser filmê "Stalker" yê derhênerê nemir ê cîhanî Andrei Tarkovsky ku mohra xwe li hunera sînemayê daye, nivîsiye û ketiye pey şopa heqîqeta film.

Welat Ramînazad der barê filmên derhênerê navdar Nurî Bilge Ceylan de nivîseke bi Zazakî amade kiriyê û li pêwendiya sînemaya derhêner bi kurdan re kolaye. Di vî hejmarê de, nivîsa Rûmet Medî ku li ser

filmên jiyana kurdan, hatine amadekirin cih digire ku ev nivîs cara yekem di malpera Bianet Kurdî de hatibû weşandin.

Mela Mihyeddîn, li ser yek ji filmên herî girîng û klasîk ên dîroka sînemaya cîhanê "The Seventh Seal" ê derhêner û senarîstê swêdî Ingmar Bergmanî nivîsiye. Welat Ramînazad jî bo vî hejmarê nivîseke din jî nivîsandiye û fikrên xwe yê der barê tînkiliya filmê Cache yê derhêner Micheal Haneke bi kurtefilmê Vîr ê Burhan Ateş re, aniyê zimên.

Di hejmara 4'emîn de Dawid Jikevir nivîseke li ser mijara "Sînemaya Polîtîk" amade kiriyê û li ser wateya tîgeha sînemaya polîtîk sekiniye. Her wiha nivîsa Rûmet Medî ku der barê filmê "Bread and Roses" yê Ken Lo-



achî de hatîye nivîsandin cih digire.

Emrah Kaplan jî bo vî hejmarê gotareke bi navê "Tîgeha Temsîlê û Cihgirtina Tîgeha Temsîlê Di Sînemayê De" nivîsiye û tê de qala mijarên tîgeha temsîlê û tîgeha temsîlê di sînemayê de kirine. **AMED**

## Li Rojava pêşbirka helbestê ya ciwanan tê lidarxistin

Bi hevkarîya Komeleya Xêrxwaziyê ya Janê Xelef a navenda wê li Londonê ye, Hêvgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê di meha çîleya sala 2021'ê de dê pêşbirkeke bi navê 'Yekem Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan' li dar dixe.

Pêşbirka dê bi zimanê kurdî be û mijar. Li gorî daxuyaniya lijneya çalakiyên Hêvgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) ya di malperên civakî de belav kiriyê, dê ciwanên ji 18 heta 30 salî yê Rojava û Sûriyeyê bikaribin tevî vî pêşbirka bibin. Her wiha di dawîya vî pêşbirka de dê xelat werin belavkirin.

Ji nav berhemên ku dê tev li pêşbirka bibin dê 3 helbestên di rîza pêşî de werin xelatkirin. Xelatên helbestên ku dê bi ser bikevin ev in: Ji bo kesa/ê yekem 500 dolar, yê duyem 300 û yê sêyem jî 200 dolar xelat were dayîn. Beriya niha Komîteya Amadekirina

Heftemîn Kongreya Hêvgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK), di kanûna 2020'î de civîna xwe ya asayî li navbenda HRRK'ê li Qamişloyê, li dar xistibû.

Komîteyê piştî guftûgoyên berfireh ev biryarên jêrin bi piraniya dangan wergirtibû:

- 1- Di sala 2021'ê de, bi "Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan" dest pê bike û di serê salê de mercên beşdara pêşbirka bi awayekî berfireh bo raya rewşenbîran ragihîne.
- 2- Biryar wergirt ku "Heftemîn kongreya HRRKê" di 16'ê Nîsana 2021'ê de li dar bikeve. Ev biryar jî li gorî rewşa koronayê û agahiyên Şaneya Kîrîzê ya Rojava hatîye wergirtin.
- 3- Komîteya Çalakiyan kar û barê xwe hetanî lidarxistina kongreya HRRKê, berdewam bike. **QAMIŞLO**

## Pirtûkên 'Em Kakeyî ne' û 'Nîgarekanî Şamaran' hatin nasandin

Li Helebçeyê bi merasîmekê pirtûkên wêneyan ên bi navê 'Em Kakeyî ne' û 'Nîgarekanî Şamaran' ên ji aliyê Rustem Resûl Axale ve hatine amadekirin.



rin, hatin pêşandan.

Di saatên êvarê de li Hala Merasîman a Kakeyîyan a Helebçeyê, bi amadebûna rewşenbîr û kesayetên Kakeyî Rustem Resûl Axale pirtûkên xwe yê wêneyan 'Em Kakeyî ne' û 'Nîgarekanî Şamaran' da nasandin.

Pirtûka 'Em Kakeyî ne' jî 157 rûpelan pêk tê, 125 rûpelên pirtûkê jî wêneyên kakeyîyan pêk tê beşa din jî kurteçîroka kakeyîyan hatîye nivîsandin.

Ji hemû deverên ku kakeyî lê dijîn, wêneyan hatine kişandin û di pirtûkê de hatine bicihkirin.

Di pirtûka bi navê 'Nîgarekanî Şamaran' de jî ji tabloyên ku Rustem Resûl Axale di nav 10 salan de çêkirine, cih digrin.

Rustem Resûl Axale der barê pirtûkên xwe de got, "Ev pirtûk karekî civaknasîyê ye û wê bibe pênasîyêk ji bo pêkhatiya kakeyî, her wiha wê bibe sîma û reftarek ji bo gelê kurd bi giştî. Armanca min a van pirtûkê nasandina kakeyîyan e." **HELEBÇE**

**N Ê Z Î K**

**YEKEMÎN PÊŞBIRKA HELBESTA KURDÎ YA CIWANAN**

**Ji 18 hetanî 30 sal**

2021

**HRRK**

XELATÊN PÊŞBIRKÊ

**Yekem: 500 Dolar**

**Duyem: 300 Dolar**

**Sêyem: 200 Dolar**

HEVGIRTINA REWŞENBÎRÊN ROJAVAYÊ KURDISTANÊ KOMELEYA JANÊ XELEF A XÊRXWAZIYÊ LI INGILISTANÊ



# Çîroka bîra elektrîkê ya Farqînê

Beriya 71 salan beriya ku ceyran bê Kurdistanê li Farqînê ceyran tê hilberandin. Şaredarê demê Yûsûf Azîzoglû, bi derfetên xwe ceyranê hildiberîne û Farqînê pê ronî dike

Qedrî Esen

Li Anatoliya û Mezopotamyayê dîroka ceyranê heta sala 1888'an diçe. Bikanîna ceyranê, destpêkê di serdema Osmanîyan de di sala 1888'an de bi kargeheke biçûk ku li Tersaneyê Halîçê ya Stenbolê hatiye avakirin dest pê kiriye.

Santrala yekemîn a ceyranê di sala 1902'an de li li navçeya Tarsûsê ya Mersînê hatiye vekirin. Ji ber wê sedemê piştî Stenbolê cihê ku cara yekemîn ceyranê lê hatiye bikanîna Tarsûsê. Piştî damezrandina Komara Tirkiyeyê di serî de Edene û Enqere hin derferên din jî gihîştine ceyranê. Mînak di sala 1954'an de ceyran çûye İzmirê.

## Çûna Stenbolê

Dema ku li rojavayê Tirkiyeyê ji bo ceyranê ev hewldan tîn dayîn, li navçeya xweş û şêrîn Farqînê siyasatmedarê kurd Dr. Yûsûf Azîzoglû şaredar e. Azîzoglû, kesekî welatparêz, şareza û ronakbirekî pêşbîn bûye.

Hê wê demê ku his û pisa ceyranê li Kurdistanê tunebûye, Azîzoglû anîna ceyranê ya Farqînê ji xwe re dike xem û ji bo anîna ceyranê ya Farqînê dest bi projeyekê dike. Di dawîya salên 1940'î de Azîzoglû, komeke teknîker li Farqînê li hev kom dike û ji bo hînkîna teknîka hilberandina ceyranê dişîne Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê.

## Vegera Farqînê

Piştî perwerdeya xwe ya 5-6 mehan ev kom teknîker vedigere Farqînê û dest bi xebatên hilberandina ceyranê dikin. Li rojavayê Tirkiyeyê cihên ku nû ceyran li wan hatiye bikanîna santralên mezin hatine avakirin. Lê li Farqînê ji bo avakirina santerelege wiha mezin derfet tunebûye.

Di serî de Azîzoglû wê koma teknîker ku mil dane ber vî karî (Yek ji van teknîkeran Tûran (Koçer) Beg e) bi biryar in

ku ceyranê bînin Farqînê. Di encama lêkolînên xwe de biryar didin ku ava Kaniya Mezin di hewzekê de depo bikin, mekanîzmaya santrala hîdroelektrîkê deynin serê û ceyranê hilberînin.

## Hilberandina ceyranê

Piştî wê xebata ku bi xema Azîzoglû bi kedekê mezin pêk tê, cara yekemîn di sala 1949'an de ceyran li Farqînê tê hilberandin û belavkirin. Destpêkê kuçeyên Farqînê bi ceyranê tîn ronîkirin, piştê mal û xan pê tîn ronîkirin. Herî dawî ev ceyran ji Hezroyê re jî tîn şandin.

Li Farqînê hilberandina ceyranê weke li rojavayê Tirkiyeyê bi derfet û santralên mezin pêk nehatiye. Weke ku li jor jî çîroka wê hat vegotin tenê bi bîr, bawerî û nêrîna farqîniyan ceyran hatiye hilberandin. Piştî ku ceyran bi wê keda mezin gihîştîye Farqînê 3 sal şûn de li Dîlokê û 5 sal şûn de jî li İzmirê hatiye bikanîna.

## Serbilîndî maf e lê...

Ji ber wê serkeftinê mafê farqîniyan ku bi pêşiyên xwe yê jîr serbilînd bin. Lê xwezî bi qasî serbilîndiya xwe li wê mîratêya pêşiyên xwe jî xwedî derketina. Ji ber ku lê xwedî derneketine, ava Kaniya Mezin ku li deşta Farqînê pê bi hezar doniman çandinî hatiye kirin û bûye mijara kîlaman, niha firikek jî jê nemaye. Dîsa avahiya Bîra Elektrîkê ku diviya niha muze bûna, bûye kavi.

## Berî xebatê tekîker bûye

Piştî ku min van agahiyan ji Mehmet Aktrarliyê niha li ser medya civakî bi nasîna Farqînê re mijûl dibe û ji bo navçeyê amadekariya hin projeyan dike hîn kir, bi kurê Tûran Beg e niha li Edeneyê dimîne Sadûn Koçer re ketim têkiliyê. Koçer, piştê kir ku bavê wî di wê xebatê de cih girtî ye û salên dirêj wê xebatê domandiye.



Koçer, diyar kir ku bavê wî berî ku tevî wê xebatê bibe jî ji tiştên teknîkê fêhm kiriyê û wiha got: "Ji ber ku me cotkariyê dikir, traktorên me hebûn. Bavê min traktorên me nedibir pîşesaziyê (sanayî), wî bixwe li malê temîr dikir. Ji ber wê jîrbûna wî dema ku ev xebat hat destpêkirin, gazî bavê min jî kirin û wî jî di wê xebatê de cih girt."

## Darbe destê wan ji Farqînê dike

Di berdewamê de Koçer, destnîşan kir ku bavê wî bi wê xebatê re girtine şaredariyê û ev tişt anîn ziman: "Heta ku ceyrana Kebanê hat Farqînê jî Bîra Elektrîkê vekiribû û bavê min lê kar dikir. Piştî darbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê em ji navenda Farqînê derbasî gundê Çirikê bûn û ji vir çûn Edeneyê. Ji ber ku vî karê jî bavê xwe hîn kir, em niha li Edenê jî karê bavê xwe dikin."

Derbarê rûmetdayîn Bîra Elektrîkê de jî Koçer, bi lêv kir ku ew cihê ku lê ji dayik bûye û mezin bûye ji bîr nake û got: "Niha jî avahiya Bîra Elektrîkê heye. Lê niha ew teknîka zikê wê nemaye. Berê borî û amûrên ceyranê tîde hebûn. Heke di pêşerodê bibe muze û cihêkî bîrdariyê tişta ji me bê xwestin em ê li gorî derfetên xwe bibin alîkar."

**Nîşe: Wêneyê yekemîn hundirê bîra elektrîkê ye û ji her sê kesên di wêna de tenê navê Tûran Beg tê zanîn. Kesê rûniştî û şewqe li serê wî Tûran Beg e. Wêneyê duyemîn jî avahiya Bîra Elektrîkê ye.**



# Serê salê û binê salê

Adar Şaman

Bi xeyalên zarokî, pîrozbahiyên sersalê; heyamên berê sersal bi xeyalên kelecaniya zarokî û bi kenê li ser lêvên wan vediguhezîn şahiyê. Xeyalên sala borî yê pêknehatî, bi bayê zivîstana sar difûrî û dibû bîngeha xeyalên sala bê. Her sala ku derbas dibe, ji bo sala nû hêvî û bendewariyên hîn mezintir pêk tîne. Her sala ku derbas dibe bi xwe re nûbûnekê jî tîne. Bi demê re guhertin û veguhertin bi pêş dekeve. Ya girîng ew guhertinên bîngehîncamên hizirandinên kûr ên ruhî û nefsi ne. Ew jî di nav demê de xwe ji nû ve diafirînin. Bi wateyêke din; sersal, nûbûna aramiya ruhî, hes-tan û mezinîna baweriya ji xwe ye.

Heçî zarokên kurdan bûn, berê li gundan di şeva sersalê de, komek zarok li hev kom dibûn, amadekariyên xwe dikirin û dema ku şevê kirasê xwe yê reş û tarî li deşt, gelî, çiya û gundan radipêça, koma zarokan dest bi gera nav gund dikirin û ji serî heyani binî li gund digeriyan.

Koma zarokan ji deh-pazdeh kesan pêk dihat; temenê wan ji şeş, heft, heşt û heyani deh-dozdeh salan bû. Zarokên gund li hev kom dibûn û di nav xwe de zarokê ji bo bibe qirdik hildibijartin, ew zarok xweşik dixemilandin, kirasêkî dirêj lê dikirin, rûyê wê/wî tenî dikirin, tûrikekî gulîvankirî bi milan ve dikirin û mal bi mal dest bi gerê dikirin. Ev koma zarokan her mala ku diçûn ber deriyê wê, li derî dixistin, bi hev re dilan digirtin û ev stran ji xwediyên malê re digotin:

"Dem û dem, niska qedem, serê salê û binê salê xwedê zarokêkî bide kebanîya malê, kebanîyê dest zêrînê, destê xwe bavej kulînê û behra qirdik virde bîne. Qirdiko; li te nemawo, te teniya sêlê li xwe dawo û te bela gundiya li me dawo!" Zarokan ji xweyîya malê, genim, savar, hêk, mewîj, hêjîr, kizwan, inab, gûz û hwd. tişt dixwestin. Xwedîya malê jî li gorî dilê wê çî bi xwesta, yan jî piyana xwe li binê embara genim dixist û piyanek genim vala dikir tûrikê qirdikê rûbîtenî.

Zarok her mala ku diçûnê xwedîya malê ew vala venedigerandin. Çiqas hindik bûya jî nedigot nadim ango nîn e. Mal jî, tev di destê jinan de bû. Çeltê-tûrikê li milê qirdik ji bo genim bû û tenê genim dixistin tûrikê qirdik. Zarokên din jî her yekî/ê tiştêk dixist tûrikê xwe. Her çendî herî û baran nedibû asteng û heyani derengiya şevê li nav gund digeriyan...

Piştî gera zarokan bi dawî dibû, diçûn maleke feqîr, hemû tiştên hati-

bûn komkirin datanîn ber destê xwedîya malê û ew jî li gorî zanebûna xwe ji wê re dibûn alîkar û xwarin çêdikirin. Hinek zarok jî diçûn pîrka beşonek difîstîn. Li herêma Mêrdîn û Botanê lîstika pîrka beşonek pir tê hezkirin û zarok dema bi ser piyan diketin malbatên wan ew fêrî wê lîstikê dikirin. Li hinek deverên din ên Kurdistanê jî lîstika "holika zarokan" heye. Zarok ji kinc û paçan konekî vedidin û jina herî pîr a wî gundî di binê wî konî de limêj dikir û piştê yek bi yek ew zarok maç dikirin. Ew konê zarokan ji hêla her kesê/î ve pîroz dihat dîtin.

Îca em dîsa vegezin ser babeta xwarinê bê ka encama wê bû çî? Kebaniya mala herî feqîr ku zarok lê kom bûbûn xwerin çêdikir, sifre datanî, tevî zarokan zikê xwe tîn dikir û her yekê/î ji xwe re hêkek digirt û diçûn mala xwe. Xwarina zêde dima jî ji wê mala xizan re dima. Hêka zarokan a kelandî di destê wan de û tevî hêka xwe radizan.

Giregir û mezinên gund jî ji bo sala nû plan û xeyalên xwe parve dikirin. Heger sala borî nebaş derbas bûya û ne li gorî kêfa gundiyan bûya wiha digotin; mala xwedê ava ku ev sal zûka di ser me re derbas bû. Hemû hêviyên xwe ji bo sala nû mezin dikirin û sondên giran ên serfiraziyê dixwarin...

Bi vî awayî dîwana gund, heyani derengiya şevê jî dihat gerandin, meselokên berê yek bi yek diştexilîn û henekên xwe bi serpêhatiyên xwe yê dema borî dikirin. Ew zebeşên ji bo serê salê hatibûn veşartin, di sersalê de derdixistin û li ber dîwanê digerandin. Tê zanîn ku kurd bi pesindayîna çîrok, serpêhatî û dîroka xwe tîn nasîn.

Di gerandina dîwanên gund de, jin xwedî gotina xwe bûn û giraniyêke jinan hebû. Ji ber ev dîwana dapîr û bapîran gelekî dihat hezkirin. Jinên temenê wan mezin, her gotineke wan ezmûnek bû û cihê wan li serê dîwanê bû. Êl û eşîr li dora wan kom dibûn. Kul û gazinên civakê tev li cem dapîran kom dibûn. Weke çavkaniya hêza çareseriyê li wan jinên zana dihat mêzandin. Loma ew bêtirs bûn!

Heçî ciwan bûn, xwe ji dîwana mezinan dûr dixistin û tevî hevalên di temenên xwe de li maleke cihê kom dibûn û sersal bi hev re pîroz dikirin.

Mirov sersalê, li gund-cih û warê xwe li dîwana dapîr û bapîran, li ber soba daran û li welatê xwe Kurdistanê pîroz bike xweş û şahî ye, lê em li xerîbiyê sala nû pêşwazî dikin. Felek xayîn e...

Sersala kurd û Kurdistanîyan her wiha mirovahiya pêşverû pîroz be!

